# Politik ART

15 GÜNLÜK EDEBİYAT SANAT VE DÜŞÜN DERGİSİ

09 Ocak 2016 Cumartesi

SAYI: 181




# Li Kurdistanê SERSAL

## li edîtorê

Xaka Mezopotamyayê cih û warê mozaîka gelan e, bawerî û rengên cihêreng di nav xwe de dihewîne. Li seranserê cîhanê Kurdistan ji aliyê çand, kevneşopî, cejn, şahî û pîrozbahiyên cihereng ve bê mînak e. Her şaristaniya şax vedaye û mezin bûye li pey xwe şopên berbiçav hiştine. Tevî hemû talana hêzên dagirker, mêtîngeran, polîtîkayên dehên salan ên asîmilasyonê û tevkujiyên çandî jî di jiyana rojane, çanda qedîm a Mezopotamya zindî ye. Ji dîroka kevnar û rengîniya jiyana li Kurdistanê yek bi yek rojên hefteyê, meh û demsal ji her erdnîgariya cîhanê bêhtir wate li wan hatine barkirin.

Nexasim jî sersal xwedî wateyeke girîng e. Tevî sersala ku di dema me de ji aliyê cîhanê ve li gor salnameyên mîladî û hîcrî tên qebûl kirin li Kurdistanê bi çend rengên cuda jî sersal tên pîroz kirin. Mînak Kurd Newrozê mîna sersalê pîroz dikin. Asûrî Sûryanî 1'ê Nîsanê mîna roja afirandinê dibînin û pîroz dikin. Dîsa Kurdên Êzîdî ji bilî Newrozê wateya sersalê an destpêka jiyanê didin Cejna Êzî. Jiyana resen a li Kurdistanê tije rojên watedar ên dibin mînaka hevkarî, parvekirina gelan e. Lê belê polîtîkayên taybet, dagirkerî, mêtîngeriyê hewl daye vê çandê talan bike, ji cewher bixe û bide ji bîr kirin.

Me mîna PolîtîkART jî li dij vê siyaseta dagirkeran careke din bibîrxistina kevneşopiyên li Kurdistanê û bi taybetî wateya sersalê hejmareke têr û tije amade kir. Bi hêviya hevdîtina di hejmareke din a bi mijarên balkêş...



*Bi sewt û lîstîka zarokan xweş e bajar...*

# Naverok...

Sersala Kurdan: Ji nû ve bûyîn/
**Medenî FERHO** ........ Rûpel 4-5

Kurdên Gîlanê/ **Şoreş REŞÎ** ........ Rûpel 6-7



Yek ji hîmdarên çanda qedîm a Rojava
Rûpel 8-9

Rola Cegerxwîn di rewşenbîriya Rojava de/
**Mustefa REŞÎD** ........ Rûpel 10

Mirin zavatî ye li Licê û Roboskî /
**Yaşar AKSU** ........ Rûpel 11

Evîn û qêrîna Kurdan Dilo Mehmed Uzun /
**Cîhan ERDOGAN** ........ Rûpel 12-13

Kevok / **A. Selam BARAN** ........ Rûpel 14

Jinên leheng ên bê tirs /
**Pelşîn TOLHILDAN** ........ Rûpel 15



*(...)*

*Zivir zivir dizivirin katjimêrên kalên çavşîn.*
*Ji hemû bav û kalên min ma mêrgeke nemir î hêşîn,*
*destên me li wê gerdûnê digihijin hev demeke çolistan,*
*li ber pencereyên ku vedibin bi ser sedsalan.*

*Bêhna pûngên min tê ji berava kevnedemeke baranî.*
*Stranek nîn im, dengek nîn im, velerizînek im!*

*Kawa Nemir*

**Herausgeber:**
Medya Presse-und Werbeagentur GmbH
Hans-Böckler-Str. 16
63263 Neu-Isenburg

**Geschäftsführer:** İzzet Akcin
**Ver. Redakteur:** Özgür Reçberlik
politikart@yeniozgurpolitika.org



www.arsivakurd.org

# Kultur û baweriya Kurdan de
# CAYÊ GAXANÎ

*Gaxan, Her hetê Vakurê Kurdîstanî de yeno zanayene. Taye cayan de têsîrê îslamîyetî û rîyê asîmîlasyonê dewlete ra hema-hema ke vîndî bîyo labelê tayê hetan de zîndî yo. No roşan, tewr zêde mîyanê kurdanê elewîyan de cande yo û dînî yo. Dustê naye de mabênê kurdanê sunîyan de kulturî yo.*






Tawo ke merdim biwazo komelê ya kî komê rindêr nas bikero, ganî tena bi rewşa rojaneye mevindo, peyser şêro qayîtê tarîxê ê komelî bo. Tradîsyonê şarî yê ke ma rastê ci yenîme, nînan ra tayê beno ke rojkî bê. Bi taybetî ki demo ewroyên de rîyê teknolojîyê komunîkasyonî ra komeli zaf rew tesîr danê yewbîn, rûmetê(1) kulturî zaf bi lez benê vila.

Labelê tayê rûmetê miletan kî estê ke tarîxî yê, koka xo peyser şona resena demanê verênan. Şanikî, destanî, vateyê verênan, rîtuelê dînî û roşanî / bayremî wina(nîya) yê.

Rûmetê kulturî û tarîxî azê neweyî peyser benê korîdoranê kanan, mabêne înan de têkilîye nanê ro, înan yewbîn ra girê danê. Mîyanê nînan de, rûmetê ke tewr zêde û hîra bala komelî ancenê kî roşan ê.

Sebebo ke rojanê verenîya ma de Gaxan yeno, ez wazen nê rêzan de nê roşanî ser o çend paragrafan binusnî. Gaxan çik o, kotî ra yeno û şarê ma ey se fîraz keno; ez xover bidîne ke cewabê nê persan bidîne.

Tayê çimeyan de çekuya Gaxanî, sey çukyêda armenkî yena nîşandayene, labelê ez bi xo no derheq de emîn nîyane. 2013 de seba konferansê ez şîbî Erîwan, oca salona konferansî de qalê na çekuye ame ra, entellektualanê armenîyan ra xebera kêsî ci ra çin bîye, înan rê zaf pêşe amê. Eke nameyê nê roşanî armenkî bo, hewce yo ke armenî pêro ey bizanê û nas bikerê. Na çekuye ke armenkî de esta kî îhtîmal o ziwananê bînan ra kewta ci.

Xrîstîyanan de Noel ke çik o, kurdan de kî „Gaxan" o yo. Xrîstîyanan de tarîxê nê roşanî şono reseno Hz. Îsayî. Xrîstîyanî ey sey rojbîyayîşê pêxamberê xo qebul kenê. Labelê tayê çimeyî, nê roşanî peyser benê rasnenê mîtrayîzmî. Fîrazkerdişê Noelî 25ê aşma kanûne der o. Na roje ki xrîstîyanîye ra raver sey rojbîyayîşê Mîtrayî ama fîrazkerdene. Mavajîme, dem amo ke no roşan Roma de bîyo fermî. Wezîrê Kulturî yê Kurdîstanî yo verên Felekeddîn Kakayî, no derheq de wina (nîya) nusneno:

„Roşanê Yelda yo ke rojbîyayîşê Mîtrayî temsîl keno û 25ê kanûne der o; seba ke na roje de biwerê (burê), Mehrperwerî (3) qerpuz û hinarî amade kerdêne. Peyê cû dem vurîya û mitrayîstî mecbur mendî, îbadedê xo dizdîya/nimite kerd. Xrîstîyanan kî seba ke keyfweşîye bidê înan, no roşan azad kerd labelê sey rojbîyayîşê Hz. Îsayî.." (4).

Eynî nivîskar têkilîya zerduştîyan û nê roşanî ser kî wina (nîya) vano:

"Newroze ra dime Roşanê zeduştîyan o tewr muhîm, Mehrgane yo û payîz ke qedîya û zimistanî dest pêkerd, yeno fîrazkerdene". (5)

Gaxan, Her hetê Vakurê Kurdîstanî de yeno zanayene. Taye cayan de têsîrê îslamîyetî û rîyê asîmîlasyonê dewlete ra hema-hema ke vîndî bîyo labelê tayê hetan de zîndî yo. No roşan, tewr zêde mîyanê kurdanê elewîyan de cande yo û dînî yo. Dustê naye de mabênê kurdanê sunîyan de kulturî yo.

Komelê kurdan de cîya-cîya nameyê nê roşanî estê: Gaxan, Gaxand, Gaxandê, Kose Gelî, Kalo, Serrnewe û Sersal.

Goreyê herêman, mîyanê fîrazkerdişê Gaxanî de ferqê hurdî estê. Mavajîme tayê cayan de bizika pêsareyî pewjîna û cîranan ra yena vilakerdene, tayê cayan de zerfetî, tayê cayan de zerfetî û danuyî pîya yenê pewtene. (6)

Gaxan de 3 rojî, tayê halan de kî 6 rojî roje yeno girewtene. Zerdustîyan de roşanê "Mehrgane" de kî 6 rojî roje esto.(7)

Kurdanê êzdîyan de "Cêjna Êzî", kakayîyan / yarsanîyan de kî "Cêjnî Merrnewî" teqabulê Gaxanî kenê.

Hetêde Gaxanî yo tewr muhîm keye bi keye (çê ve çê) fetelîyayîşê Kalê Gaxanî yo. Kalo, merdimêde kokimo erdişsipî yo. No mêrik, turikê ya kî heqîveyê erzeno harmeyê xo ser, keyeyan ra fetelîno, bi çuyê destê xo dano beran ro û çekuyanê taybetîyan vano. Mavajîme;

*Serê serre binê serre,*
*Kalik/Kalê Gaxanî nawo amo no çever de*
*Xizir çimê kesî pey de meverde. (8)*

*Varyantêde nê vateyan bi kirdaskî wina yo:*
*Serê salê, binê salê,*
*Xizir vayê hatîye vê malê,*
*Xwedê lawikek bide buka vê malê. (9)*

Tabî nê çekuyî her ca eynî nîyê; manaya ci eynî bo kî şekil de vurînê.

Kalo, gêrîyayîşê xo de tena nîyo, cinîya xo Fatike kî lewe der a. No mîyan de gencî wazenê ke nêzdîyê Fatike bê la Kalo bi çuyê destê xo dano înan ro, nêverdano nêzdî bê.

Kalê Gaxanî, bi no to re çîyê werdene keno top; mavajîme gozî, tuyî, dendikî, qaxî, ardî, ron... Şan (son) ke ame, doman û ciwanî, keyeyê (çêyê) de yenê pêser, çîyo ke Kaloyî do arê wenê, keyfweşîye kenê.

Vateyo Peyên: Gaxan, komelê kurdan de wayîrê cayêde muhîmî yo. Labelê se pêroyîya kulturê ma, no kî roje bi roje vîndî beno. No sebeb ra heme dezgeh û sazîyê ma wayîrê mesulîyetêde giran ê. Her kurd, her dezgeh û sazîyê kurdan; mavajîme rojname û kovarî, radyo û televîzyonî, komelî, întîtusyonî ganî Gaxanî rê wayîr vejîyê, ey bidê naskerdene, seba fîrazkerdişe ey rayverîye bikerê. Bi taybetî kî seba domanan. Şaredarî / beledîyayê ke destê welatperweran der ê kî şikînê no derheq de gamanê muhîman bierzê.

Bi hêvîya gaxanêde serfirazî, serra newîyêde sey pêroyîya miletanê cîhanî, miletî kurdî rê kî bextewarî û serkewtiş wazen.

***Gaxan Pîroz bo!***

***Cêrnotî:***

**1)** rûmet (n): Bi tirkî "değer".

**3)** mehrperwer: kesê ke tîje fîraz qebul kenê.

**4)** Kakayî, Felekeddîn, rojnameyê Hewlêr, 9.10.2012, sorankî ra çarnayoxê tirkî: Casim Rênas, www.dengeazad.com 24.05.2013.

**5)** Kakayî, F., eynî nivîs.

**6)** Derheqê pîrozkerdişê Gaxanî de seba agahdarîya zêdeye, nîyade;

● Çem, Munzur, Gülümse Ey Dersim, Deng Yay. İstanbul, 2013, r. 154-162,

● Çeko, Rojên Bi Rûmet û Ziqnawitî, kovara Vate, 1977, Nr. 1,

● Nadire Güntaş Aldatmaz, Gaxandî, kovara Vate 2015, Nr. 43

**7)** Kakayî, F., eynî nivîs.

**8)** Çem, Munzur, Dersim Merkezli Kürt Aleviligi, Vate Yay., İstanbul, 2011, Çapa 2., r. 57.

**9)** Çem, Munzur, eynî eser, r. 59.



# Sersala Kurdan: Ji nû ve bûyîn

Salnameya yekemîn a Kurdan, li gorî Şems, (Mazda) hatiye amade kirin. Ev despêka hişmendiya gerdûnî ye... Êdî sal û meh, dem û dewran têne naskirin, bi parçekirineke bi zanebûn têne binavkirin. Sersal jî pîroz tê dîtin, ba dugire, demsal diguherin, nûbûn û nûkirin pêk tê!..

Mînak; 16'ê meha Rojê, piştî Newrozê cejna herî mezin ya Mecusiyan e û bi navê mihrîg(c)an tê binavkirin. (Gan, pêvek e û li gorî morfolojiya ziman wateyeke din dide gotinê. Çargane-çarîne, dugane-duyane, yek malik, dumalik, çarmalik û hwd.)

Medenî FERHO

Newroz ku weke sersala Kurdan tê dîtin, şoreşeke kulturî û fîzîkî ye. Di aliyê diyalektîka dîrokê de sê aliyên wê hene; civakî, xwezayî û ezmanî... Newroz toreya herî kevin a Kurdan e û bûye malê gelên herêmê tevan. Îro jî, ev kevneşopî dewam dike. Di Taq-î Bîstan de tê gotin ku merasîmên dibin siya "dara pelzêrîn" de dihatin kirin, hêza xwe, binyata xwe, cewherê xwe ji vê toreya kevin digirtin. Toreyeke tay-î zaman e!...

Newroz bûye bingeha nirxên civakî. Ya balkêş jî ew e ku Xwedawendên jin di vê guhertina bingehîn de bûne pêşeng. Di wateya "paqijî, evîn, bereket, dayin, xwedî kirin, fêrkirin, zindî kirin, bi can kirin û aştîxwaziyê" de ye.

Hişmendiya efsaneya Newrozê di her demjiyana civaka Kurd de serdest e. Civaka îdeal bi rêxistinî ye, wekheviyê û edaletê diparêze.

Şems-Şêşims (Ahura Mazda) xwedî wateyeke kozmîk e û di kozmogoniya Kurdan de, piştî teqîna mezin Big-Bang'ê, navenda kêşa "bazinê pîroz" e.

***Fesala salê li gorî peywendiya mirov û xwezayê***

Bi hewldanên Înanna û Dembuz, yekemîn festîvala biharê hate lidarxistin (di mîtolojiya Mezopotamya jêrîn de). Ev festîvala Basimbarê ye. Di nava demê de bû cejin û wek Çarşema Sor hate binavkirin. Li gorî "salnameya rojê" destpêka salê, cejna salê tê pîroz kirin. Li gorî salnameya mîladî çarşema piştî 13ê Nîsanê (ango çarşema pêşî ya teqwîma mîladî ya nereformekirî) tê pîroz kirin. Lê ev roj, ew roj e ku Melek-î Tawis bi Fermana Yezdanê Mezin ruerdê/xwezayê dixemilîne... Çarşema Sor jî navê xwe ji rengê rojê distîne û destpêka teqîna malzaroka jiyanê ye. Ev bereket û xêratên ku bi meha Nîsanê re dest pê dikin, di pez û dewar de, di dexlê de, di hatina kar û xebatên malê de zêde dike. Rengê Basimbarê bûye ala Kurdan jî. Kesk û sor û zer...

Ev demjiyan, salnameya gelerî ye û weke "salnameya gel" tê binavkirin. Gel li gorî serpêhatî, çîrok û çîvanokên Mambêjan, guhertina demsalan, bûyerên dramatîk û tofanên xwezayî, dem parçe kir. Ev salname, têkiliya mirov û xwezayê ye; hinekî berxwedana mirov li hemberî xwezayê ye. Heta demên dawî jî di nava gundiyên Kurdistanê de, navên demsalê, bi guhertinên xwezayî dihat binavkirin. Navê mehên salnameya îro jî, li gorî vê yekê hatine dîzaynkirin û binavkirin. Zipik, çile, çilê çil, kebîs, heyva kevanî, heyva li çardeha, Kanuna pêşî, Kanuna dawî û hwd. Şûban Musa (Sibata bi bereket), barana Nîsane, ewr-î Nîsan, Pûşber, Kewçêr û hwd. Teknîka di cotkariyê de dihatin bikaranîn jî li gorî têkiliya mirov û xwezayê dihatin amadekirin.

Zivistan, demsala kebîs e, bi meha Nîsanê re bi dawî dibe. Li gorî Mambêjan, Îştar-Înanna, li gel Dembûz jî qesra Dembûz derdikevine ser rûyê erdê û tevlî festîvala destpêka jiyana xemlenîgarî dibin. Ev meh wek bûka salê tê naskirin.

Di meha Hezîranê de yek, di meha Dembuzê de yek, di navbera 2 û 5ê mehê de xwarinên gelerî tên dayin. Ziyafet!.. Di van xwarinan de keç û xort cilên nû li xwe dikin û govendan digerînin. Govend, wateya jiyana civakî ye!..

Ev dem û dewranên têgihiştin û xwendina cîhanê ne.

***Afirandina salnameyê weke asta şaristaniya bilind***

Mirovatî digiha qonaxe ku dest bi têgihiştina tew û tebeqeyên rûerdê dike.

Pêşî xwe nas kirin, piştre herêma xwe naskirin. Demjiyana ku çiyayên bilind agir difûrandin ji mêj nemabû. Ev destpêka xwendina dîroka cîhanê ye.

Vê carê, di xwendina dîroka cîhanê de, hate fêmkirin ku lehengê cîhanê jî dîsa mirov e. Piştî fêmkirina lehengiyê, dest bi nivîsandina dîroka cîhanê kir. Bi destpêkirina nivîsandina dîroka cîhanê, mirov bû xwedayê cîhanê.

Di herika jiyanê de çekên mirov jî guherîn. Azmûnên mirovên nêçirvan bêhtir dijwar û dirêj bûn. Di kevirê "heste" de hostatiya mirovatiyê gelekî bi pêş ket. Dema hosta û şagirtan e... Ev keda mirov e.

Mirovî nirxê kedê fêm kir û amûr û alavên çêkirî jî parastin. Dem hat ku her amûrî pêdiviya amûrekî din derxiste holê. Ev fêrbûna kedê û demê ye...

Vê yekê, mîna salnameyên gelerî, kanûnên gelerî jî derxistin holê!...

Ji bo van zanistan û dîrokê bi başî û li gorî pêdiviyan radestî paşerojan bike, pêdivî bi parçekirina demê hebû. Ademê ku şev û roj parçe kir, giha asta ku salê parçe bike û bi nav bike...

Ev asta herî bilind ya kulturê ye, hêza mejî û dest e...

Hêza mêjî, demjiyana efsane, destan û helbestên dirêj dabû destpêkirin. Bi mihrîcanên ku di demûdewrana Xwedawendan, di nava civakan de wek cejnan bi pîrozî hatin pêşwazî kirin. Dîsa jî destan, efsane û helbestên dirêj, digeriyan û her diçû zêde dibûn. Her mirovê kal pirtûkxaneyek li ser lingan bû... Kalên malê tore, efsane, destan û helbestên dirêj, bi bûyerên dramatîk re li hev dipêçan, bi beden dikirin û wek şîret û qewêtî ji zarokên malê re vedigotin. Bi zêdebûna vê cewherê giranbiha, mejî hêza xwe zêde dikir. Ezber xurt dibû, xurtbûna ezberê hêza mejî û hewngiriyê derxiste holê.

***Ji peyvên devkî ber bi gotinên nivîskî ve***

Hewngiriyê bivê nevê nivîsandin derxiste holê... Zimanê devkî û ezber bû haveyn û nişûka zimanê nivîskî... Fîgûrên di taqên şikeftan de, di şeqafan de dihatin xêzkirin, bûne gotin û li ser keviran, kevalan û kêlan hatin xêzkirin.

Gelek zanist kêlên goran, yan jî taqan wek pirtûkên destpêkê, wek nameyên ji bo paşerojan bi nav dikin.

Li gel van tevan, demjiyana rêxistiniya civakî derkete holê; sermiyanê malê, jin cih da mêr, mêrê malbatê cih da serdestê êlê... Serdestê êlê cih da mîrê eşîrê û di encamê de key û keyser, qiral û tacîdar derketin holê...

Ev derbaskirina mekan û demê ye... Nivîs û fîgurên li ser taqên şikeft û şeqafan giha qonaxa dewletî... Sefer, şerên demên berê di fîgur û peykeran de, di keval û taqan de xêz kirin.

Ademê ku fêrî kanûna xwezayê bû, piştî serdestiya li hemberî xwezayê kanunên xwe çêkirin. Ademê ku kanûnên xwe çêkirin, dîsa guhertinên xwezayê li ber çavan girtin û gav avêtin. Bi vê yekê çavdêriya xwezayê kir. Ev çavdêrî bi gelek nifşan û gelek sedsalan pêk hat. Fêrbûna guhertinên xwezahî, "keşf"a destpêka mirovatiyê ye... Piştî gelek nifşan û sedsalan, rêza demsalan jiber kirin, pêşî kin-kin gotin û bi nav kirin. Piştre xelekên zincîrê bi hevûdin ve girêdan û li pey hev rêz kirin. Navên ku hîna di nava Kurdan de wek Çilê, Çilê Çil, berfbarin, pûşber û hwd. mînaka vê ne.

Ev naskirina cîhana nû bû...

**Mîrateya Kawayê Hesinkar**

Serhildana Kawayê Hesinkar destpêka salnameya Kurdan tê qebûlkirin. 20, 21, 22 û 23ê Adarê Newroza Kurdan û destpêka jiyana azad û bi rûmet e. Di heman demê de destpêka salnameya rojê ye...

Şems-Mazda ango roj bingeha salnameya Kurd e. Wek Salnameya Rojê jî tê binavkirin û destpêkê efsaneya Kawayê Hesinker û rizgariya Kurdan (û mirovatiyê) ye.

Di nava Kurdan de sembola sala kevin, sala nû û jiyanê hene. Li gel sê sembolan, fîgurê mîzaha reş û spî jî heye. Kalê Salê yê herî navdar yê Ewropiyan e û bi navê Bav-Noel (bi rengekî ji xasên Xirîstiyanan Nikolas e) tê nasîn.

www.arsivakurd.org

**Newroz: Sosyokultura harmonîk**

Hejîr û Hinar herî zêde li Kurdistanê hene… Du mêweyên behîştê ne… Tirî û sêv herî zêde li Kurdistanê hene… Du mêweyên behîştê ne… Berû û tû, herî zêde li Kurdistanê hene… Du xelatên Êzda ne…

Çar demsalên cûda û ezmanê bi bixura van demsalan tê mesihandin, tenê li cografya Kurdistanê hene… Cil û bergên di rengê keskesora di banê ezmanan de û bi qesebê stêrikan tê neqişkirin, tenê li Kurdistanê heye… Folklora ku awaz û lorîna bilûra xwedawendan xuroşiya jiyanê dibalivîne, tenê li Kurdistanê heye…

Kirasê spî, dilê spî, gotina spî û nanê bi kûl û derdan bûye qût û mewdanê wî. Aliyek spî, aliyek kesk, aliyek sor, aliyek zer... Ev rengên destpêka afirandina erd û ezman in. Êzda dibêje; pêşî tarî-reş hebû... Yanî, ji nava reşê ev reng teva hatin derxistin. Ji bo ku, rengên di dilê mirovan de coş û xiroşê bixemilîne, ked û têkoşînek lazim e.

Piştî dem û dewranan ku afûr û kafûrên mezin derketin holê, cîhan jî serûbinî hev bû û mirovahî, ji giyanê çêkirina felsefê hate dûr kirin. Xwedawend, ji ezmanan hatin ser rûwê erdê. Despotîzma kujerî car din kat da û pişkivî... Di duyemîn heyama despotîzma xwedawendan de Kawayê Hesinker derket û agirê Prometheus li serê Çiyayên Zagrosê pêxist. Ronahiya agirê Kawayê Hesinker, duyemîn car asoyên paşerojên jiyanê ronî kir. Hingî ala azadiya ku li serê Çiyayên Kurdistanê dibalivî, rengê xwe, ji agir û xwezayê; ji av û axê, ji ezman û rojê stand. Ezman, erd û roj, av û hewa û mirov, xelekên jiyana bi rûmet û azad...

**Agirê rojê, bixura erdê, dilê mirov û rengê ezman...**

Ev navê roja nû bû... Jiyana nû bû û mohra têkoşîna mirov û keda mirov li jiyanê dida. Bi navê Newrozê, di malzaroka jiyanê de rûnişt û reng veda. Ev şoreşa duyemîn ya mirovahiyê bû... Yanî xeleka duyemîn ya Newrozê...

Wek destana duyemîn ya mirovahiyê ku bi pêtên agir hate nivîsandin...

***Sersala bêdemiya berfireh û vejîn***

Di bin siya dara pelzêrîn de, Kawayê Hesinkar û gelê Kurd ji bo jiyaneke bi rûmet, azad û bextewar têdikoşin. Ev têkoşîna dibin mercên gelekî giran û zor de pêkhat, bi serketineke dîrokî tacîdar bû, ne tenê gelê Kurd tevahiya gelên herêmê rizgar kir.

***Em bi helbesta Ehmedê Xanî dest pê bikin;***

*Destana qalkirina Newrozê*
*Navdanîna demsala kêfxweşî û şadûmanî*
*Bi awayên toreyên kevnar ên Kurdistanê*
*Ku wan navê wê Sersal danî*
*Û wek cejna hevgîhana yaran bi hesab danî*

Ligel Kurdan pîrozkirina sersalê gelekî cûda ye û xwe di dema bêdemiyeke berfireh de destnîşan dike. Aliyê xwe yê felsefîk heye, aliyekî xwe yê hiyerarşîk jî heye. Di vê hiyerarşiya wek daristanekê her cûra darmêwe û nifş hene… Kurdistanê bi vî rengî tê nexşe kirin. Li gorî hişmendiya Zerdeşt ku dibêje, di ava herik de du caran şiştin çênabe. Lê kevneşopiya Kurdistan û gelê Kurd pirkulturî û pir gelî ye. Di her demjiyana dîrokî de ev taybetmendî û xisleta pîroz li Kurdistanê hatiye parastin. Îro jî, di şerê sêyemîn yê cîhanê de, ku di kesayeta Suriye de derketiye û navend mina şerê yekemîn yê cîhanê, car din bûye Kurdistan, Kurd tevahiya gelan û nirxên mirovahiyê diparêzin. Ev comerdî û maquliyek dîrokî ye.

Dema ku Kawayê Hesinkar ciwan ji hovîtî û faşîzma Dehaq rizgar kirin, ne tenê ciwanên Kurd, tevahiya ciwanên gelan jî kuştinê rizgar kirin.

**Sembol û dirûvê wan**

Di sersala Kurdan da Kalê Salê heye, sala bihurî temsîl dike; Ciwanê Salê heye, sala nû temsîl dike… Lê di aliyê zanistî û jiyan abadanî de Bûka Salê-Jiyana Ciwanik heye, ew jî jiyanê temsîl dike. Di sersala Kurdan de Kalê Salê bi sale re diçe, Ciwanê Salê bi sala nû re dikevê dewsa wî; Bûka Salê, Jiyana Ciwanik e naguhere. Jiyan Abadan e…

Qirdik jî heye!... Di sersalê de, kesayetê herî giring e. Rûyê wî boyaxkirî ye, cilê wî qetiyayî ne, kumekî rengîn bi gulik li serê wî ye, bi ketina malan de ew dest bi axaftinê dike. Gotinên qirdik girîng in; bijartî ne. Ji ber ku Qirdik, civakê temsîl dike.

Bûka Salê, ji nave wê jî diyar e, keç e û zindî ye, ciwan e, bihar e û dayik e. Hişmendiya ideal temsîl dike, zindî dihêle, ciwan dihêle… Yên kevin red nake, yên nû wek hêvî li ser bingeha kevin û di ronahiya rojê de, bi agirê aştiyê ava dike.

Kalê Salê; rihspî ye, pora wî spî ye û gijolî ye, kirasekî spî lê ye, pişta wî vekirî ye, qof bûye, darek (gopalek) di destê wî de ye. Westiyayî xuya dike. Dema ku ew û Ciwanê Salê li ser Bûka Salê têne hemberî hev, zêqif dibe, dixwaze bide xuyakirin ku ew jî ciwan e…

Ciwanê Salê; xortekî di kewna xwe de ye. Cil û bergên wî li gorî herêman tê guhertin û nû ne. Dirêj e, bejin zirav e, sing mertal e, navmil pehn e û li xwe ewle ye. Kum û kolas, yan jî serbendê kulavî li sere wî ye. Pîpoyek di destê wî de ye. Devliken e û her dem di kêleka Bûka Salê de ye.

Ligel Kalê Salê, Ciwanê Salê, Bûka Salê û Qirdik, komek keç û xortên din jî hene. Di serdana li malan de, Kalê Salê cih cihan, Ciwanê Salê cih cihan diaxivin, Bûka Salê û koma keç û xortan, yan jî zarokan na-axivin. Herî zêde qirdik diaxive û dilîze. Tenê di strana salê de kom tevlî koroyê dibe. Qirdik rengê civakê ye. Daxwaza xwe jî bi rengekî şûm û dijwar dike.

Kalê Salê jî naxwaze Jiyana Ciwanik-Bûka Salê bi dev Ciwanê Salê ve berbide.

> ***Li gorî hişmendiya Zerdeşt ku dibêje, di ava herikî de du caran şûştin çênabe. Lê kevneşopiya Kurdistan û gelê Kurd pirkulturî û pir gelî ye. Di her demjiyana dîrokî de ev taybetmendî û xisleta pîroz li Kurdistanê hatiye parastin.***

**Efra kal û ciwanî**

Di nava koma sersalê de (êvara 13´ê Çile diqulibe 14´ê Çile) Qirdik qet pêça xwe nade efra Kalê Salê û Ciwanê Salê di kêleka Bûka Salê-Jiyana Ciwanik de radiweste, pêşî li koma pey xwe dinêre, berê xwe didê civatê, dibêje: "Kê kê li erdê da / Bûka sale ya wî ye", piştre bangî Kebaniya Malê dike.

**Gotinên destpêkê, yanî ketina hundir dubare dike;**

*Serê Salê Binê Salê*
*Xwedê kurekî bide kebaniya malê*
*Zarok birçî ne li malê*
*Kebaniyê delalê behra Qirdik*
*Helîl û mewîjan derîne ji kewarê*
*Tê bibînî cejna Newrozê a 21î Adarê*

Dema beriya vê zarok li derî dixin, bêyî ku wan bifermoyî hundir bikin, koma zarokan bibez dikeve hundir. Civak rûniştiye, sifra wan raxistiye, kişûmat şiraniya zivistanî li ber mêvanan e. Zebeşekî mezin jî li nîvê odê ye. Ew Zebeş saet di 12.00'an de, nîvê şevê tê şikandin. Gelek caran civat, berî koma zarokan biçe mala wan, amadekariya ku teatroyekê bi wan bidin lîstin, Kalê Salê û Ciwanê Salê bi efra berdin hev planan dikin. Di planê wan de rola sereke jî ya Kebaniya Malê ye. Ji ber ku koma zarokan ne civatê, Kebaniya Malê muxatab digire, her û her bangî wê dikin. Ev toreyek kevin e û hîna ji demsalên dayiksalarî maye. Ji ber ku kebanî malxwêt e û qûtê malê jî di destên wê de ye. Hîna li devê derî, dema piyên xwe diavêjin aliyê din yê pîpînka hundir, bi hev re dibêjin:

*Serê salê binê salê*
*Xwedê kurekî bide kebaniya malê*
*Heçî nedê mar pêvedê*
*Kebaniyê ser zêrînê*
*Destê xwe biavêje kûlînê*
*Behra qirdik (û hevalên) wî zû derînê*

Civat zimandirêjiyan dike û bi armanca Kalê Salê û Ciwanê Salê berdin hev, dest bi kelmemaniyan dikin, gotinên kelevajî dikin û nav di herduwan didin. Pirranî Kalê Salê sor dikin. Mînak, dibêjin "Ciwanê Salê çav berdayê Bûka Salê, tê çawa qebûl bikî?" Bi vî rengî û gotinên cûda navbera her du aliyan sor dikin.

Zarok jî van metroziyan û kelmemanan baş dizanin, armanca wan jî fêm dikin. Ew jî ji bo vê lîstika teatral amade ne. Armanca wan danheva qûtê zêde ye. Berî ku Kalê Salê û Ciwanê Salê werin pêşberî hev, Qirdik xwe diavêje holê;

*Dem û dem qîskê bi qedem*
*Xwe gihande sere salê*
*Kebaniya Malê –Civata malê-*
*Qirdik ji bo sersalê hate malê*
*Xwedî kûrekî bide Kebaniya Malê*

Ev gotinên Qirdik daxwazê zêde dike, hinek ji kesên di civatê de peran jî didin. Ciwanê salê van gotinan dibêje û ber bi Bûka Salê ve diçe:

Kalê Salê bûriye
*Riya wî wek pembûyê spî ye*
*Lepikên di destên wî de*
*Ji Hevrîşmê badayî ye*
*Hewramî li nava mile wî ye*
*Gûlika kolos sor û spî ye*

**Kalê Salê hers dibe ber bi Ciwan diçe dibêje;**

*Demûdewran e, agir agirê kalan e*
*Tecruba kalo bi salan e*

Ciwanê Salê û Kalê Salê destên xwe diavêjin newqa hev û dest bi efra dikin. Hinekî kêferatê dikin, şerê xwe dirêj dikin û kêfa civatê tînin. Di encamê de Ciwanê Salê kalî didê erdê.

Ciwanê Salê rûdinê qelûnê pêdixe û duxanê bi ser serê xwe dixe. Bûka Salê jî diçe kêleka Ciwanê Salê.

*Kalê Salê berê xwe didê Kebaniya Malê*
*Serê salê binê salê*
*Xwedê kurekî bide Kebaniya Malê*
*(çar carab dubare dike)*

**Qirdik di wê kêlîkê de çemê xwe li erdê dide;**

*Teq teq bi req req*
*Tore heye heq bi heq*
*Kebaniya Malê me jî bibîne*
*Weke her sal bide heq*
*Ev Kebaniya Malê ye*
*Qutê malê bi destê wê ye*
*Qirdik Qasidê sersala Kurda ye*
*Wek her sal divê kebanî bide heq*

**Kebaniya Malê jî tevlî teatro dibe;**

- Ev çi bela ye

**Qirdik hêrs dibe;**

Kebaniyê ser zêrînê
*Destê xwe biavêje kulînê*
*Behra qirdik zû derînê*
*Kebaniya bi Şemalê*
*Daw û dêl bi gemarê*
*Behra qirdik di kewarê*
*Biçe bîne û bide şîrîn zarê*

**Kebaniya Malê bi dilekî xweş dibêje,**

*- Ez qiymet bi Qirdikê salê didim*
*Ew ne qirdik e, qendê Kurda ye*

**Bi van gotinan re, Kebaniya Malê para qirdik û tevahiya zarokên pê re dide. Zarok û qirdik bi yek dengî dibêjin:**

*Serê dik-î bi kulav e*
*Binê dik bi kulav e*
*Xwedê kûrê malê zu bike zava*

Tiştê ku zarok kom dikin, li malekê, car caran li gastînekê-qelaçekî ew bi xwe tifikê çêdikin, agir pêdixin û xwarina xwe çêdikin, bi hev re dixwin. Govendê digerînin, heta sibehî şahiya wan didome.

www.arsivakurd.org

# Kurdên Gîlanê




**Şoreş REŞÎ**

Gîlan, li gorî rêvebirina pergala erdnîgariya Îranê eyaletek e. Li bakûr û rojavayê Îranê ye û navênda xwe bajarê Reşt e. Wateya navê Gîlan, ji netewa gîl tê. Li herêmê neteweke cuda ye, ne Faris in, neteweke serbixwe ne. Lê ji aliyê ziman, cil û berg, kevneşopî, jiyana civakî ve nêzîkî Kurdan e, bi taybetî jî nêzîkî Kurmancan e. Ji zimanê wan re Gîlekî tê gotin û nêzî 3 mîlyon nifûsa wan heye. Tê gotin ew yek ji bermayiyên Medan in. Wateya Reşt jî li gor bûyerên dîrokî û civakî texmîn dikim ku ji êla Kurdan a bi navê Reşî tê. Lewra wê êlê Kurd bi hezaran salan ew der ji xwe re weke war girtiye. Bajarekî hema hema li kelêka Deryayê Kesk e.

Gîlan û derûdorê wê, ji Med´an wir ve her tim Kurd lê nîştecîh bûne û daîm di nava sînorên Kurdistanê de bûyê. Eyalet, li rojhilat bi Mazenderan (Teberîstan), li rojava bi Erdebîl, li başûr jî bi Zencan û Qezvînê hatiyê dorpêç kirin. Herêmeke bi av û daristan e.

Navê Gîlanê din jî E/Amarlu ye û gelêk niqaş li ser nav hene. Nivîskarê Xorasanê K. Tevahuddî dibêje: "Emar: Ez dibêjim, dibe ku ew bi şaşî hatibe nivîsin û di eslê xwe de "Amar" be. Kurdên Xorasanê wan bi "Amaran" bi nav dikin. Amar tê wateya embarê. Amara yek ji êlên xwedî hêdbar yên Kurmancên Xorasanê ne û li bajarên Nîşabûr, Qoçan û li beşa Emarlo ya Gîlanê û deverên Qazwînê dijîn." Ez tevlî wê nêrînê nabim ku dibêjin ew nav tê wateya embarê. Îhtîmaleka mezin e ew nav ji navê serdarêkî tê. Lewra di nava wê federasyonê de êl û serokên bi vî navî hene.

Wek tê zanîn piştî desthilatdariya Medan, Axameniyan împaratorî çêkirin û di bin desthilatdariya wan de gelek qraltiyên Kurd ava bûn. Yek ji wan jî yê li rojavayê Çiyayên Elbrûz bû ku bi navê "Qraltiya Amard" dihate gotin. Ew xelekeke gelêk girîng e û lêkolînên kûr jê re divê. Bi vî avayî derdikevê holê ku dîroka vî navî 2500 salan zêdetir e. Gelek balkêş e ku îro jî êla bi navê E/Amar-lû yê li Gîlanê dijî, ew dibêjin em Reşî ne. Bi dîtina min ew ne tesadûf e, îhtîmaleka pir mezin e ku ew qraltî, ji aliyê heman êlan ve hatibe damezirandin. Îro li navênda Anatolyayê, li dora bajarê Kirşehîrê, di nava gundên giredayî Reşîyan de gundên bi navê "Emarlû" hene. Ev têkîlî û giredana wan a bi hev re dide nîşandan. Lewra ji heman êlê, bi heman navî û di heman rewşa civakî û dîrokî de ne.

## Ziman û Ol

Li Gîlanê zimanên mîna Kurdî (Kurmancî, Lekî, Hewramî), Gîlekî, Talîşî, Tatî, Azerî û Farisî tên axaftin. Bi qasî çavdêriya min wek mûzeyeke lîngûîstîkî û olî ye ku li benda lêkolînên îlmî ye. Mîna ku tê gotin Talîşî zaravayekî Medan e; ew çiqas rast e nizanim, lê pêwîstî bi lêkolînan heye. Ev zimanê zaravayê Kurdî bi wendabûnê re rû bi rû ye. Girêdayî bi vê yekê, li navenda Anatolyayê stranek balkeş heye. Sed sal berê hatiye gotin û pir balkeş e ku di nav de peyva 'tat' derbas dibe. Ew jî îşareta têkilîyên berê ye. Kilam wiha ye:

*"Min got:*
*Keko ê hatin û ê hatin*
*Nivî erew e û nivî tat in*
*Onbaşîye heynan anîn*
*Li ser malê Egîd Mistefa lihev nehatin"*

Mixabin îro Tat pir hindik mane. Tê gotin ku Med û Persan welatê wan dagir kirine û heliyan e. Îro li herêma Merend (bajarekî ku Azerî lê dijîn) çend gundên wan mane.

Li Gîlanê, gelêk Kurdên bi zaravayên cuda diaxivin dijîn. Li Gîlanê wek 2000 malbat ji Xorasanê hatine (dema Nadîr Şah) ku Kurdên Xorasan, Mereş, Kobanê û navênda Anatolyayê ji heman êlan e. Yên li herêmê, bi zaraveya "Lekî" diaxivin jî îhtîmalekê pir mezin e ku ew di dema Kerîm Xanê Zengenê de hatinê wir. Di deftera Osmaniyan tahrîr-nifûs a ji sala 1539'an de mayî, dinivîse ku Lek-Şêxbizin ji Qastamonûyê heta Erzirûm-Otlûyê bela wela wek koçeran dijîn. Parçên wan li Haymana, Çankiri, Adapazari, Bolu, Edanê, Xaneqîn û hwd. hene. Şêxbizin êlêka giredayî Ler-Lek û Lor e. Li Tirkiyê ji bo wan Şivankara (Şebînkanî) jî tê gotin û hatê gor texmîna min bajarê Şebînkarahîsar jî navê xwe ji wan girtiye. Li bajarê nezikî Gîlanê Qezwîn ê, Kurdên Kelhor, Lek, Kurmanc, Soran, Hewraman dijîn. Olên mîna Yarî, Îzzedînî, Îslam (Şîa û Sunnî) û Elewî hene ku nifûsa Kurdan nezikî 2 milyon û nîv in. Li Gîlan dora bajarên Esalîm, Rezwanşar jî Soran û Hewramî hene.

> Li Gîlanê zimanên mîna Kurdî (Kurmancî, Lekî, Hewramî), Gîlekî, Talîşî, Tatî, Azerî û Farisî tên axaftin. Bi qasî çavdêriya min wek mûzeyeke lîngûîstîkî û olî ye ku li benda lêkolînên îlmî ye. Mîna ku tê gotin Talîşî zaravayekî Medan e; ew çiqas rast e nizanim, lê pêwîstî bi lêkolînan heye.

## Têkiliya xwe bi cîhanê û Kurdên din re qet nîne

Di sala 2003'an de min ji Rê (Tehran) berê xwe dabû Gîlanê. Piştî Rê, Kereç, Qazvînê tê. Dibêjin 50 hezar Kurd lê dijîn. Piştî 50 km Loşan tê. Li wir tê gotin nêzîkî 100 hezar Kurdên Lek û Kurmanc dijîn. Piştî Loşan, bajarokê Mencîl tê; li wir jî Fars, Kurmanc, Lek û Talîşî dijîn. Hema piştî 10 km bajarokê Rûdbar e û ew jî tevlîhev e. Piştî wî bajarokê Rûstemabat tê ku li wir jî Kurmanc û Talîşî dijîn. Ji Rûstemabat dema mirov ber bi çiyan an jî ber bi Behra Kesk dinêre, 60 gundên Kurmanc lê hene. Herêma ku Kurmanc lê dijîn, jê re E/Amarlû jî tê gotin, ku me gotibû ew navekî dîrokî ye. Gund û bajarokên herêmê li dora çiyayên Sabelan avabûne û li hember hev in. Li wir ez çûm serdana gund û bajarokên mîna Çorê, Xaskûl, Çilkeser, Reşî, Paşmahallê, Zîban, Xorgan, Talûkû, Lîyavil, Çûmbil û Çarmihelê û piranî ji êla Reşîyan e. Li gundê Reşiyan, li ber postexanê jinekê ciwan a bi cilên reş û meleseke reş rûniştibû; digot "Em Reşî ne." Paşê em bûn mêvanê Apê Şaban Mihemmed Elî Pûr (75 salî) ku digot "Cedê me Reşî-Rehmetava ye", ji gotina wî min ev derxist: Gundî wek ji êla Reşiyan tê zanîn lê piştre navê wî kirine Rehmetava. Wekî gundên me li Anatolyayê. Mirov navên Kurdî nabîne, lewra êlên hatî, li çend gundan belav bûnê û îro jî bi navên dagirkeran tên xwendin.

Kurdên Gîlanê têkiliya xwe bi cîhanê û Kurdên din re qet nîne. Têkîlî tenê bi riya dibistan û TV'yê bi dewletê re heye ku ew jî xeteriya helandinê derdixê holê. Eger ji aliyê Kurdên derveyî Gîlanê ve mûdaxeleyeka çandî û zimanî neyê kirin, mirov dikare bibêje ku di demêka kin de ewê bihelin. Kurdên derve dikarin di aliyê sîyasî de, bi serledanan, bi şandina CD, kaset, fîlm û pirtûkên ziman û çandî de alîkarî bikin.

## Dîroka wan ji hev cuda ne

Li rojavayê herêma E/Amarlû jî bajarê H/Xalxalê heye ku hinek Kurdên Kurmancîaxêv lê niştecîh in. Dîroka wan bi yên Gîlanê ve ji hev cuda ye. Reşiyan, Osmaniyan di sala 1601'an de bi cîh kirine. Dibê ku serdema Kurdên îro li Xorasan dijîn û di sala 1593´an de şandibûn Weramîn (Rê) jî li wir mabin. Yan jî dema mîrîtîya Dulqadir ya li başûrê Tirkiyê hilweşiya Kurd hatibin wir. Lewra Kurmancên li wir bi yên Rojhilatê Kurdistanê ve jî cuda ne. Vana Kurdên ji rojava hatinê; li hin derên navenda Anatolyayê û Dîlok û Efrînê ve bi navê Celikî tên nasîn. Dîsa li bakurê Xalxal ber bi sînorên Azerbaycanê ve jî koloniyên Kurdan hene, lê em nizanin ka gelo rewşa wan çawa ne.

## Dîroka serdêma kevin

Di dema Medan de (BZ. 612-555), di serdema Îslamiyetê de (piştî salên 650) Kurd li wir hebûn û ewder bi sedan salan bû qada şer. Nivîskarê Azerî yê bi navê Kesewî, di pirtûka xwe ya bi navê "Şehrî Yaran û Gumnam" de dibêje: "Li Teberîstan, 400 salan mirîtîyeke Kurd hebû. Arteşa Îslamê 400 salan nikarî wana têk bibe û heta mintiqeya Qezvîn di destê wan de bûn. Elewî bûn." Li gorî lêkolînên Prof. Gonulla Larsson û Sundberg ên Swêdî: "Di navbera salên 760-1050'an de dema Vîkîng berê xwe didin Bexdayê li vê herêmê rastî Kurdan hatin".

www.arsivakurd.org

Dîsa em dizanin ku xelîfe Harûn el-Reşîd (786- 809), êlên Kurdan bi şervaniya xwe navdarên mîna Badilî, Reşî û Şadî yan ji Kandahar, Mazenderan, Xorasan û Sîstanê anîn dinê û di xeta navbera Canîk (Samsûn), Qeyserî û Sîsê (Adana) de li hemberî Bizansan wek mertalên Îslamê bi cîh kiribûn. Piştre, mirov dikare qala dewleta Şadî (951) ya Kurdê li herêmê bike. Dîsa Kurdên Kirmanckî (Zazakî) diaxivin, di sala 1240'an de di bin rêberiya Şemsedîn Muhammed de dewleteka bi navê "Padîşahiya Gor-istan û Sîstan" ava kiribûn û ew di sala 1371'an de hilweşiya. Gor, navê êlê ye û demekê herêm bi vî navî jî tê bilêvkirin. Deylemî, kalên Kurdên Kirmanc yên îro li bakûr dijîn. Xanedanên Deylemî yên girîng ev in: Bawandî (665-1349) başûrê Xezer; Ziyarî (927-1090) li Tabarîstan û Gûrgan; Kengariyan (916-1090) (Mûsafîrî/Salarî) li bakûrê rojavayê Îran; Cestanî (sedsala VI-XII) li Gîlan, Rûyan û Talîş.

## Serdema Osmaniyan

Mîrîtiyên Kurdên li Gîlanê, li hember êrîşên Tirkan (1030) û Moxolan (1200) nesekinîn. Êlên li wir, bi piranî ber bi Anatolyayê ve herikîn û li rojavayê Anatolyayê mîrîtîyên xwe damezirandin. Yek ji wan jî Dulqadirî bûn. Dîroknivîsên Tirk vana wek "Tirkmenên Şamê" binav dikin. Ûzûnçarşili wan wiha tîne ziman: "Li Elbîstan û Mereşê rûdiniştin; bi mêranî û şîdeta xwe têne nasîn û ji Bozokên girêdayî Oxûzan e. Di sala 1339 an de (1521 ji holê rabûn) di bin hakîmiyeta Memlûkan de mîrîtiya xwe damezirandin. Paşê ew heta Meletî û Xarpûtê Şreh kirin. Serokê xwe yê yekemîn Zeynûddîn Qaraca ye." Gor jêderên Safewî ew 80.000 mal (80x6= 480.000 kes) bûne. Di salên 1540'an de, di nava êlên Kurdên li Besnî ye de, êlên ku berê girêdayî Dulqadiriya ye bi navê Eymûrlû (Dexşîr, Qaraca Arablû, Bexdatlû, Cacalû, Încîlî, Mekelû) êlek hebû. Dîsa di nava êla bi navê Cerîd de (Bayir Cedîd, Soylemezlû, Sari Silêman, Kûş Qerelû, Tevekulû) hebû û bi navê Tevekulû îro li Gîlanê gundek heye. Li gorî defterên Osmaniyan yê 1500'an, federasyona êlê li Semsûrê yek jî Dulqadir e û gundekî bi vî navî jî heye. Li Mereş û Elbîstanê diçûn zozanan û zivistanê derbas dikirin. Xuya dike ku ew êlên piştî 1519' an edî nemane. Ew jî bi avabûna dewleta Safewî ve û bi êrîşên Osmaniyan re girêdayî ye.

## Serdema Safewiyan:

Ew êlên Kurdên li başûr û rojavayê Anadolê, mîrîtiyên xwe hilweşandin, ber bi rojhilat ve çûn û dewleta Safewî damezirandin. Serokê Pezgewran Ristem, li şopa Şah Îsmaîl digeriya ku bikuje. Mîrîdên Heyder kurê wî Îsmaîl û Îbrahîm li Erdebîlê veşartin. Prof. Sumer dibêje: "Navê jinikê Aba (Ebe) bû ku ew ji êla Dulqadirî bû. Ji alî êla Şamî yê Dulqadirî, ku kalê zarokê Heyder in ew revandin Gîlanê." Şamî êlêkê Kurd e û niha li Xorasanê dijîn. Navê wan esas Sêvikî ne. Sumer: "Îsmaîl, di 12 saliya xwe de (1499) ji Gîlanê vediqete û diçe Ercûvanê. Îsmaîl ji welatê Deylem (rojavayê derya Kesk) tê Tarûmê û li dora wî 1500 murîdên ji Şamiyan hebûn. Dema Îsmaîl vegeriya Lahîcanê li cem wî, mamostê xwe yê ji êla Şamî Huseyn Beg, kalê xwe yê Dulqadirî Abdal Beg, Hadîm Beg, Rustem Beg, Beyram Beg, Qere Pîrî û Aygût Beg hebûn." Ew navê êl û begên li dora Îsmaîl jî didin xuyakirin ku ew ji Reşî û ji êlên bi Reşiyan re eleqedar in.

Xeleka balkeş a bi Dulqadiriyan re giredayî ew e ku, di demên berê de bi Lek/Şêxbiziniyan re tevgeriyane. Em dibinin ku di dema Osmaniyan de ew li navbera Kinik û Berendiyê bi cîh hatibûn kirin ku baca xwe bidin. Lê ew qewlê xwe neanîn cîh û bi Lekvanik ve bûn yek û li Kurt Kulaxiyê êrîşê Îsmaîl Paşa kirin û malê wî talan kirin. Di sala 1705'an de li ser wan ferman derket. Ewên ku belav bûnî hinek hatin navenda Anadolê û îro cîranê hev in. Hema tiştî em li Gîlanê dibînin ku cîranê hev in.

## Gotina dawî

Di encama wê dîroka dûr û dîrej de îro em dibînin ku li eyaleta Gîlanê û derûdora wir gelêk Kurd dijîn. Xeteriya li ser wan a herî mezin asîmîlasyon e! Eger mudaxalê neyê kirin, ew ê di demêka kin de bên helandin. Ji bo ku ew zînde û li ser lingan bimînin pêwîstî bi Kurdên li derveyî herêma erkên ser milên xwe bînin cih. Di nava van de kar kirin, têgîhandin wan a dîrokî û civakî û di alî ziman de alîkarî ji wan re pir girîng e û ew erka me hemûyan e.

Bîbliyografiya:
1- H. T. Kurdên Xorasanê-Cîld II, K. Tewahodî-Meşhed
2-Kürtler-Mehrdad R. Izady-Doz
3-Stran û Awazên Anatoliya Navîn, rûp 173, Ş. Reşî
4-Kürtler ve Kurdistan Tarihi-1- Botan Amedi-Firat-Dicle yy. 1991-İstanbul
5-Kürtler-Mehrdad R. Izady-Do
6-Anadolu Beylikleri-Prof.İsmail Hakkı Uzunçarşılı-TTKY-Ankara-198
7-Safevî Dev. Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin rolü.Prof- F. Sumer
8-Dogu Anadolu da Goçebe Kürt Aşîretî-Îsmaîl Beşîkçî-Yurt 1992
9-Safevî Dev. Kuruluşu ve Gelîşmesînde Anadolu Türklerînîn rolu.Prof- F. Sumer
10- Osmanli iskan Sîyasetî ve aşîretlerîn yerleştîrîlmesî-prof. . Halaçoglu

Kurdên Gîlanê têkiliya xwe bi cîhanê û Kurdên din re qet nîne. Têkilî tenê bi riya dibistan û TV bi dewletê re heye ku ew jî xêteriya helandinê derdixê holê. Kurdên derve, dikarin di aliyê sîyasî de, bi serlêdanan, bi şandina CD, kaset, fîlm û pirtûkên ziman û çandî alîkarî bikin.



www.arsivakurd.org

# Yek ji hîmdarên çanda qedîm a Rojava:

# Asûrî-Sûryaniyên herêma Cizîrê

**Asurî- Suryaniyên Kantona Cizîrê li Rojava heta berî sedsala 20'an weke malbat yan jî komên piçûk bi Kurdan re hevbeş dijiyan. Nêzîkatiyeke mezin di navbera civaka Suryanî û Kurd de heye ji ber sedema jiyana hevbeş a hezarê salan.**



Heger hewldaneke me ji bo danasîna rewşa civakekê wekî civaka Asûrî-Suryanî ya resen li Rojavayê Kurdistanê hebe, teqez em ê nikaribin wan ji bakur û başûrê welêt cuda bikin, ji ber ku cihê xwe wek Kurdan di dîrokê de girtine û mohra xwe jî li hemû rengên jiyanê xistine.

Wekî din, mirov nikare aliyên cografî û demografî yên Rojavayê Kurdistanê îro weke herêmeke serbixwe û veqetandî ji Bakur û Başûrê Kurdistanê binirxîne. Ji ber ku hîna sedsal jî temam nebûne ku xetek ji têlan û leşkerên biyanî hatiye danîn di singa vê axê de ku yek xweza û yek bedena çandî ya hev temamker e.



ALAN ROJ*

### Ji Waşokaniyê heta bi Serêkaniyê

Di çarçoveya vê mijarê de pêwîst e ku em bi kurtahî behsa kevnariya herêma Rojava bikin û bi taybetî jî îşaret bikin bi erdnîgariya di navbera Firat û Dîcle de ku wek deşteke dirêj xwe di navbera çiyayên Şengal, Kizwan û Bagokê de veşartiye.

Kevnariya herêmê di warê şênbûnê de vedigere heya 6 hezar sal berî zayînê li gorî zanyarên arkeolojî ku li navçeya Serêkaniyê (Waşokanî) diyar dibe. Waşokanî navê herî bi bandor yê wê demê yê Hûriyan e. Piştî Hûrî û Mîtaniyan, Împaratoriya Asûrî jî cihekî xwe girtiye û desthilatdariya xwe gihandiye heya vê herêmê. Cihê herî bi nav û deng yê vê imparatoriyê Girê Lêlan e (9 km li başûrê bajarê Tirbespiyê) ku wek paytexteke qralê Asûriyan (Şemşî Eded) li vê deştê hatibû avakirin û navê wê ji Şexna (ya ku di serdema Hûriyan de weke navenda aborî û tîcarî hatibû avakirin) guhert û kir Şibet Anlîl.

Di serdemên navîn de ev gel rastî qirkirinê û înkareke mezin hat, bi taybetî di demên xîlafetên Îslamî û Moxol û Osmaniyan de ku gelek komkujî û wêranî bi serê wan de hatin. Ji ber vê yekê jî ew ji warên xwe koçber dibûn yan jî xwe dispartin çiyayên Bagok, Şengal, Behdînan û Hekariyan.

### Pêla dawî ya bicihbûna Asûrî-Suryaniyan li Rojava

Asurî- Suryaniyên kantona Cizîrê li Rojava heta berî sedsala 20'an weke malbat yan jî komên piçûk bi Kurdan re hevbeş dijiyan, lê ne bi awayekî mayînde wek Kurdan.

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn û bi behaneya, Ermenî û Asûrî û hin eşîrên Kurdan destek da Rûsyayê, Osmaniyan fermana qirkirina hemû neteweyên ne Misilman û Kurdên dijberî wan ragihand û guhertina demografiya Bakurê Kurdistanê kirin armanc. Vê demê li dijî van netewan qirkirineke mezin pêk hat. Êdî pirraniya Asûrî-Suryaniyan û  bi wan re komên Kurdên Êzîdî û Misilman jî berê xwe dan Cizîra Rojavayê Kurdistanê û di nava eşîrên Kurd de yên li wir bi cih bûyî jiyan û hejmarekê ji wan jî berê xwe da herêma Dêre Zorê. Ew li hundirê Sûriyê di bipêşxistina jiyana heyî de bûn xwedî roleke mezin.

Wê demê Asûriyên ji Bakurê Kurdistanê yên Colemêrgê berê xwe dan Başûrê Kurdistanê di bin parastina Îngilîzan de li derdora Dihokê û deşta Mûsilê bi cih bûn. Piştre, sala 1933'an ew ji artêşa Iraqa nû re dibin parçeyekî sereke.

Lê salên 1933-1934'an ji ber nakokiyên di navbera Iraqiyan û Asûriyan de û bi gumana xwesteka Asûriyan di avakirina herêmeke xweser de li deşta Nînovayê û ji ber xiyaneta Îngilîzan bi wan re, rastî komkujiyeke mezin hatin û pirraniya Asûriyan berê xwe da Cizîra Rojava û li derdora çemê Xabûrê li bajarê Til Temir bi cih bûn. Li vê herêmê 35 gund avakirin. Ji bilî wê jî hin malbat li gundên herêmê li kêleka Kurd û Suryanan bi cih bûn.

### Rola Asûrî û Suryaniyan di jiyana civakî de

Bi despêka hatina van netewan li herêmê, bi taybetî li Qamişlo û Hesekê bi avakirina dêran mijûl bûn. Sala 1927'an yekemîn dêr dan avakirin li herêma Qamişlo û hêdî hêdî jiyana xwe li gorî sîstema jiyana nû ya piştî komkujiyan dane rûniştandin. Ev civak hingê di pêşxistina çandinî û pîşesaziyê, nexasim jî di ya hesinkariyê de bi roleke mezin rabûn.

Cimaeta Asûr-Suryanî her wiha di kêleka her dêrê, dest bi avakirina dibistanan kir û komeleyên zanistî ji bo pêşxistina xwendinê vekirin. Wekî din bi Kurdan û Ermeniyan re di avakirina bajarê Qamişlo de ku berî hingê gundekî piçûk ê ser bi Nisêbînê bû, bi dewreke diyarker rabûn û ji bo vekirina stadên sporê û holên sînemayê ew her li pêş bûn.

Hingê Rojava di warê çand û kar de di serdemeke nû de bû û aliyên çandinî û pîşesaziyê di qonaxeke ewqasî kin de bi destên civaka xwe ya zengîn, bi reng û zimanên xwe pirr bi pêş ket. Ev rewş li Rojava wisa dewam dike heta bi hatina Partiya Beasê ku bû sedema xirakirina vê mîrasê û guhertina her tiştî bi navê Îslama siyasî û Erebkirinê. Hingî koçberiya van netewan hêdî hêdî ber bi Ewrûpa û Emerîkayê ve çêbû.

### Cihûwarên Asûrî-Suryaniyan li Cizîrê

Di salên 1920-1930'î de li navçeya Tirbespiyê hejmareke mezin a Asûrî-Suryaniyan xwe lê girt. Hingê li pirraniya taxên bajêr bi cih dibin, her wiha 10 gundên wan hene li derdora bajêr. Ev gund bi pirranî hevbeş in di navbera wan û Kurdan de, tenê sê gund hene ku xwerû şêniyên wan Suryanî ne.

Li Til Temirê 35 gund li kêleka çemê Xabûrê hene, wekî din hejmareke mezin li bajêr jî dimînin û dêreke mezin li wir heye.

Li Hesekê, Dirbesiyê, Serêkaniyê, Amûdê û Qamişlo gelek Asûrî-Suryanî, Ermenî û Keldanî li navenda bajêr dimînin.



**Di salên 1920-1930'î de li navçeya Tirbespiyê hejmareke mezin a Asûrî-Suryaniyan xwe lê girt. Hingê li pirraniya taxên bajêr bi cih dibin, her wiha 10 gundên wan hene li derdora bajêr. Ev gund bi pirranî hevbeş in di navbera wan û Kurdan de, tenê sê gund hene ku xwerû şêniyên wan Suryanî ne.**

### Çand û ziman

Di mijara ziman de em dikarin cudahiya di navbera peyva Suryanî û Asûrî de şîrove bikin û li ser vê bingehê em ziman bidin naskirin.

Du sedemên sereke hene ji bo bikaranîna her du navan bi rengekî hevbeş. Ya yekemîn ew e ku du zaravên ziman de di civaka Asûrî de peyda dibin, zaraveyê rojhilatî ku jê re Suryanî tê gotin û zaravayê rojavayî ku Asurî tê gotin û ev cuda bûn bi sedemên qutbûna cografî di demên şer û dagirkeriyên bê navber de hatiye avakirin. Mîna civaka Êzîdî ku peyva rojhilatî ji hemû Êzîdiyên herêma Xaltan re tê gotin û ji Êzîdiyên deşta Sirûcê re peyva Rojavayî ango Dinayî tê bikaranîn.

Sedema duyemîn ya ku bandora mezin lê kiriye mijara parçebûna dînî ye û derketina mezhebên dêrê ye. Ji ber ku Suryanî li aliyên Dêra Ortodoks bûn û Asûrî li aliyê Dêra Katolîk bûn.

Her wiha piştî avakirina sîstema dewleta netewperest bandoreke mezin li zimanê Asûrî-Suryanî bû û ji ber ku zimanê Erebî wek zimanê fermî û tekane li Sûrî hat ferzkirin wekî zimanê Kurdî rastî Erebkirin û înkarkirinê hat.

Lê piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê xwendina zimanê Asûrî-Suryanî êdî li dibistanan vegeriya ye û herkes xwe fêrî zimanê xwe û zimanê cîranê xwe dike û mamosteyên Suryanî jî dest bi xebatên perwerdeyê kirine.

### Cejn û rêûresm

Civaka Asurî-Suryanî di warê rêûresmên civakî û olî de pirr dewlemend e. Her wiha nêzîkatiyeke mezin di navbera civaka Suryanî û Kurd de heye ji ber sedema jiyana hevbeş a hezarê salan. Lê berî ku em behsa nav û merasîmên cejnan bikin divê em hin sembolên ku pirrî caran di cejn û merasîman de tên bikaranîn û wateya wan bidin nasîn.

Weke nimûne, bikaranîna bixûrê wek sembola saxlemî û efûkirina kêmasiyan e. Bikaranîna mûman îfadeya dilpakiya mirovên Xiristiyan e û ronahiya canê pak e. Roja yekşemê roja ku Hz. Îsa ji nav miriyan rabûye û wisa pîroz tê dîtin û li ser vê bingehê hatiye hilbijartin ji bo Xirîstiyanan, çawa ku înê ji bo Misilmanan û şemî ji bo Cihûyan û çarşem ji bo Êzîdiyan rojên pîroz in. Qurbana pîroz ku ji nanê genim pêk tê sembola bedena Hz. Îsa ye û meya tirî (şerab) sembola xwîna wî ye, ev jî daxwaza Hz. Îsa ji şagirtên wî re bû dema nan qet kir û li wan belav kir, di piyalê de mey vexwar, belav kir û got, "Her kes bila bixwe û vexwe". Maneya vê wisa tê şîrovekirin ku Hz. Îsa xwe feda kir. Û ev fedakariya pîroz ji dêvla qurbaniya lawiran ve tê bikaranîn.



**Cejna qiyametê:** Weke cejna mezin û pîroz tê naskirin û wekî ku ew îfade dikin (cejna cejnan, serdema serdeman cejna qiyametê ye). Wateya vê cejnê jî rabûna Hz. Îsa ji nav miriya ye, piştî sê rojên ji mirina wî bi xaç kirinê û dema wê jî dikeve navbera 4 Nîsanê û 8 Gulanê. Û ji bo vê cejnê jî nimêjên taybet berî wê bi sê rojan dest pê dikin.

Piştî hemû rêûresmên olî di hundirê dêrê de malbat dest bi serdana hev dikin û şîranî li zarokan tên belav kirin, her wiha rengkirina hêkan û çêkirina kulîçeyan jî dîmenekî ber bi çav e li mal û dikanan.

**Hefteya Êşan:** Hefteya berî cejna Qiyametê ye û roja yekem jê re tê gotin Yekşema Şeanîn ku di vê rojê de Hz. Îsa derbasî Orşelîmê (Quds) bûye û gel bi çiqilên darên zeytûn û xurma pêşwaziya wî kiriye. Ji ber vê bîranînê her kes zarokên xwe bi cil û bergên nû dixemilîne û di destên wan de gurzên gulan û darên zeytûnan ber bi dêrê ve diçin û dest bi sirûdên taybet yên vê rojê dikin.

Lê roja herî pîroz roja înê ye (Îna Êşan) roja ku Hz. Îsa hatiye çarmixkirin.

**Cejna Akîto:** Cejneke netewî û civakî ye ji bo pîrozkirina xwezayê, bingeha wê vedigere çanda Mezopotamyaya kevin. Û li gorî nêrîna civaka Asûrî-Suryanî, ev cejn ji serdema xwedayên Babiliyan û Asûriyan ve maye û weke sersala nû ya Babilî-Asûrî tê naskirin ku jiyan xwe nû dike bi rengê biharê di riya zayîna xwezayê de. Destpêka wê jî weke sersala Êzîdiyan serê Nîsanê ye.

Di vê cejnê de her kes derdikeve seyranê bi cil û bergên gelêrî, cil û bergên dîrokî yên serdema imparatoriya Asûriyan jî ciwan li xwe dikin û dîlan û şahî li gorî çanda civakê tên gerandin.

**Cejna Barbara:** Cejneke civakî, olî ya kevin e. Xwe ji mitolojiya Xirîstiyanan dide der û efsaneyeke ji dîrokê li pişt vê cejinê heye bi navê "Şehîda Barbara Xas". Li gorî çîroka hevpar, Barbara keçeke nazdar û bî ye ku baweriya xwe bi ola Xirîstiyantiyê aniye û li hemberî bavê xwe û qralê welatê xwe yê pûtperest disekine û ji rastiya baweriya xwe nayê xwar tevî êşkenceya giran heya ku jiyana xwe ji dest dide.

Di Cejna Barbara de her kes ruyên xwe û zarokên xwe rengorengo dike û cil û bergên komîk li xwe dikin û derdikevin kolanan û kêf û seyranê dikin. Wekî din zarok li malan digerin ji bo şêraniya Barbara bixwin. Ew jî ji qelandina genim û garis bi tevlîkirina hinar û şekir û hin tiştên din e. Ev cejn rastî 3-4'ê Kanûnê tê.

**Sersal:** Rojbûna Hz. Îsa li cem Xirîstiyanan weke 25'ê Kanûnê tê qebûlkirin û weke cejna sereke tê pîrozkirin. Di rojên mitaaqib de sersal jî tê pîrozkirin ku li gorî teqwîma reformenekirî rastî şeva 13'ê Çile diqulibe 14'ê Çile tê, çawa ku rojbûna Hz. Îsa teqabulî 6'ê Çile dike.

Tevî ku ev cejn bûye cejnek ji bo hemû netewên cîhanê û herkes li gorî xwe pîroz dike, lê xweşiya vê cejnê pir taybete li Kantona Cizîrê.

Merasîmên cejna civakî şeva 31'ê Kanûnê (berê 13'ê Çile) li her malê û taxê û gundî dest pê dike, kombûnên ciwanan li bajar û gundan ava dibin, serdana malbatan ji hev re tê kirin û dengê muzîkên Kurdî, Erebî û Suryanî ji her malê tê.

Lê ya herî balkêş ew e ku her komek ji zarok û ciwanan kom dibe û rûyên xwe tenî dikin yan bi rengên cuda rengîn dikin bi şêwazekî ken bi xwe bînin û li pêşiya mala radiwestin û bi hev re dibêjin "Serê salê , binê salê, xwedê kurekî/keçekê bide kebaniya malê". Êdî şekir û fêkî li wan belav dikin û peşkên avê tavêjin ser serê wan. Çi Kurd û çi Suryanî, ev cejn bi vî rengî di nava hemû pêkhateyan de belav e.

**Bîranîna Şehîdan:** Cejneke neteweyî ye ji bo bîranîna komkujiya Sêmêlê. Ev komkujî bi destê leşker û êşîretên dewleta Iraqê sala 1933'yan de hatibû kirin. Bi vê boneyê kombûnên mezin li navendên partiyan de tên lidarxistin û veguheriye bîranîneke gelêrî. Wekî din gelek cejnên olî di civaka Suryan-Asûr de peyda dibin li herêma Cizîra Rojava li gorî mezhebên her kilîseyekê, lê ev cejnên ku me bi bîr anîne civaka Asûr-Suryan bi hemû beşên xwe bi hev re pîroz dikin.

*Rojnamevan

# Rola Cegerxwîn di rewşenbîriya Rojava de

Weşandina kovara Hawar di 1943'an de tê rawestandin. Piştî derketina Sûrî û Lubnanê ji bin desthilata koloniyalîzma Fransî, êdî serdarên Ereb, heya ji wan tê, rê nadin weşanên Kurdî. Kovara Ronahî jî ku li Beyrûtê dihate weşandin, tê rawestandin. Piştî wefat kirina Mîr Celadet Bedirxan di qezayeke bêbext de, xebatên Bedirxaniyan yên çandî û siyasî li Sûrî bi dawî dibin. Kamuran Bedirxan diçe Fransayê û xebata xwe li wir berdewam dike.



Mustefa REŞÎD

Di 1946'an de li Rojhilatê Kurdistanê Komara Mahabadê tê avakirin, ku ew herêm wê hîngê di bin kontrola Leşkerê Sor de bû. Ev bûyera dîrokî berê pir Kurdan ber bi Sovyetan ve difitilîne. Mixabin piştî 11 mehan komar ji aliyê rêjîma Îranê ve tê hilweşandin û rêveberên wê tên bidarvekirin. Piştî vê bûyera xemgîn, di sala 1949'an de niwênerên herçar beşên Kurdistanê li Çiyayê Dalanper li hev dicivin û bi hev re Peymana Sêsînor îmze dikin. Ji ber Rojavayê Kurdistanê, bi navê tevgera Xoybûn kesekî ji mala Cemîl Paşa amade dibe. Li gor vê peymanê divê Kurdên her çar beşên Kurdistanê alîkariya hev bikin, heya ku her çar beş rizgar bibin.

### Hawar û Cegerxwîn

Di Hawarê de hin helbestên Seyda Cegerxwîn hatine weşandin. Lê belê, rola Cegerxwîn di Hawarê de ne roleka diyar û bi bandor e. Lê di 1945'an de Dîwana Yekan ya Seyda Cegerxwîn tê weşandin û di 1948'an da romana wî ya evîndarî "Cîm û Gulperî" tê weşandin. Di 1954'an da dîwana wî ya duwem "Sewra Azadî" li Şamê tê weşandin û her wisa piştî demeka kurt romana wî ya li ser zordariya çînayetî "Reşoyê Darê" tê weşandin. Ev pirtûkên Cegerxwîn, bi taybetî jî "Sewra Azadî" û "Reşoyê Darê" di nav gel da li Rojavayê Kurdistanê bandoreka mezin li rewşa siyasî û çandî dikin. Gelo çima?

Hê di sala 1928'an de li Sûriyeyê partiyeka komûnîst hate damezirandin, lê ew heya 1953'an di çarçoveyeke teng de ma. Di 1945'an de Partiya Baas jî hate damez,randin. Helbet, piştî şerê cîhanê yê duwem, dem dema tevgerên neteweyî bû û dema tevgera komûnîstî ya înternasyonal bû. Di jiyana siyasî ya Sûriyayê de ev her du partî di nav gel de roj bi roj xurt dibûn û partiyên kilasîk wek Partiya Gel û Partiya Niştîmanî bê bandor dibûn. Ji ber ku Partiya Baas Erebî-netewperest e, pir Kurdan şansa xwe di Partiya Komûnîst de didîtin; bi hêviya ku heger ew bibe desthilatdar, ewê mafên xwe yên neteweyî bistînin, wisa pir kes bûn endamên vê partiyê; yek ji wan jî Seyda Cegerxwîn bû.

### Roleke sereke dilîst

Ji sala 1954'an heya destpêka 1958'an azadiyeka siyasî demokratîk li Sûriyayê peyda bûbû; endamên parlamentoyê bi awayekî demokratîk ji aliyê gel ve dihatin hilbijartin. Serokê Partiya Komûnîst û serokê Partiya Bass a Sosyalîst jî di parlamentoyê de cîh girtin.

Rola Cegerxwîn di nav cemawerê Kurd de dibû roleka sereke. Ne tenha li herêma Cizîrê, ew dihate Helebê û diçû Şamê jî û xwendekar, karker û cotkarên Kurd di vê partiyê de organîze dikirin. Da ku ev partî di nav cemawerên Kurd de xurt bibe, endamên wê li herêmên Kurdî di xelekên xwe yên rêxistinî de pirtûkên Seyda Cegerxwîn belav dikirin, helbest û romanên wî ji gel re dixwendin. Helbet ev tişt li xweşiya gel diçû û wisa vê partiyê di nav Kurdan de şax berdida. Hê jî bi ser de, serokê Partiya Komûnîst jî Kurdekî bajarê Şamê bû. Ev jî dibû sedem ku Kurd bawer bikin, ya herî baş ew e ku ew xwe bidin aliyê vê partiyê. Helbestên Cegerxwîn, bi taybetî jî yên di "Sewra Azadî" de û romana wî "Reşoyê Darê" bi temamî di şopa komûnîzmê ya înternasiyonal de bûn.

### Di helbestên wî de înternasyonalî

Helbestên seyda yên wek "Pîra Torê", "Aferî Qazî Mihemed Aferî", "Kurdistan" û gelekên din ji bo hestên Kurdan yên neteweyî mîna rûn û nivîşk bûn; û helbestên wek "Diyan Biyan Fû", "Ey Heval Pol Robson", "Xortno Herin Mehrecan" û gelekên din, ji bo hestên navneteweyî (înternasyonal) pir bi bandor bûn. Di wê demê de Dewleta Tirkiyê ji vê rewşa li Sûrî gelek tirsiya ku bi rêya Kurdan komûnîzim ji Sûrî derbasî Tirkiyê bibe. Dewleta Tirk sînorê li gel Sûrî bi têla elektrîk û mayînên binerd kîp kir, da ku ti kes derbas Bakur nebe. Heya niha jî ev mayîn dibin sedema kuştina pir kesan.

### Têkilî bi Partiya Komunîste re radiweste

Partiya Baas tirsiya ku Partiya Komûnîst li Sûrî bibe desthilatdar. Rabû doza yekîtiya Sûrî li gel Misirê kir û wisa di 22.02.1958'an de Sûrî û Misir bûn yek dewlet. Piştî demeka kurt serokê Misirê Cemal Ebdul Nasir demokratiya parlamenter ji holê rakir, hemû partî qedexe kir; di nav wan da Partiya Baas jî hebû. Di wê demê de li Sûrî 20 hezar kes ketin zîndanan, piraniya wan komûnîst bûn, helbet pir Kurd jî, û Seyda Cegerxwîn jî di nav de.

Lê belê, hê berî yekîtiya Sûrî û Misirê, hin Kurdên ku bûbûn endamên Partiya Komûnîst (Seyda Cegerxwîn jî di nav de) gihîştibûn wê baweriyê ku hesabê malê û sûkê li hev nayê; ew ji Partiya Komûnîst dilsar bûbûn û çalakiyên xwe di nav rêzên wê de rawestandibûn. Li hêla din ve, hin kesayetiyên ji "Komika Hawarê" wek Osman Sebrî, Nûreddîn Zaza li gel hin kesayetiyên ji herêma Cizîrê wek Abdulhemîd Derwîş, Hemze Newêran û kesên din dixwestin partiyeka Kurdistanî ji bo rizgarkirin û yekîtiya Kurdistanê ava bikin. Ev komika ji Cizîrê û Şamê dibihîse ku li Helebê jî komikeka ku ji Partiya Komûnîst veqetiyaye dixwaze partiyeka Kurdî ava bike. Wisa her du komik digihînin hev û bi hev re Partî Dêmokratî Kurd li Sûriyeyê ava dikin. Lê belê Seyda Cegerxwîn ne di nav van komîkan de ye. Ew pir dereng dibe endamê baskê rastgir.

***Cegerxwîn ne tenha li herêma Cezîrê, ew dihate Helebê û diçû Şamê jî û xwendekar, karker û cotkarên Kurd birêxistin dikirin. Da ku partî di nav cemawerên Kurd de xurt bibe, endamên wê li herêmên Kurdî di xelekên xwe yên rêxistinî de pirtûkên Seyda Cegerxwîn belav dikirin, helbest û romanên wî ji gel re dixwendin.***

### Endaman diçin Bakurê Kurdistanê

Ev partiya Kurdî dest bi xebatê dike, endaman pir dike û karên xwe bi pêş dixe. Yek ji wan karan ew e ku çend endam diherin Bakurê Kurdistanê ji bo du armancan: 1) Peywendiyan lidar bixin ku bingehek li Bakur jî pêk were û li wir jî partiyeka Kurdî bê avakirin. 2) Ji ber ku Dewleta Tirk hemû pirtûk û berhemên ku peywendiya xwe bi doza gelê Kurd re hene dide wendakirin û têk dibe, bila ev kes hewl bidin ji koşk û hucreyên xoce, mela û kesên din van pirtûkan rizgar bikin. Bi rastî jî beşekî mezin ji pirtûkan digihînin Başûrê Kurdistanê û hinek pirtûk jî li Rojava, bi sedema bûyerekê, mixabin ku têne şewitandin.

Di salên dema yekîtiya Sûrî û Misirê de û salên piştî wê re jî endamên rêveberiya Partî Demokratî Kurd pir caran têne binçavkirin û êşkence kirin. Hinek ji wan nikarin li ber xwe bidin û hinek jî - wek Osman Sebrî, bi qehremanî li ber xwe didin. Di warê çandî û zimanî de, ev partî bi gelemperî hemû belavok û daxuyaniyên xwe bi zimanê erebî diweşîne.


### Xetê siyasî dibe du parçe

Di Îlona 1961'an de şoreşa Başûrê Kurdistanê dest pê kir. Bi berdewamiya şoreşê re berê Kurdên Rojava êdî bêhtir ber bi Başûr va difitile û êdî di nav cemawerên gel de xebat bi hêrzana ji tevger Başûr tê meşandin. Ji lewra, gava di sala 1964/65'an da li Başûr dubendî pêk tê, li Rojava jî dubendî derdikeve meydanê. Helwesta hin endamên rêveber di zîndanan de û dubendiya li Başûr dibin sedem ku li Rojava jî dubendî pêk were. Baskê rastgir bi rêveberiya Ebdulhamîd Derwîş xwe dide aliyê Mam Celal û baskê çepgir bi rêveberiya Osman Sebrî xwe da aliyê Barzanî. Piştî têkçûna tevgera Başûr di 1975'an de û di pey re, di bin bandora tevgera Başûr de, her ku diçe ev bask pir caran têne perçekirin ku îro hejmara wan gihîştiye behtirî 15'an. Xebata van hemû partî û rêxistinan di warê çandî û zimanî de, dîsa bi gelemperî di çarçova zimanê Erebî de dimîne. Helbet, hinekan ji wan hin rêzekovarên bi Kurdî jî weşandine, lê di çarçoveyeka teng de mane.



www.arsivakurd.org

# Mirin zavatî ye li Licê û Roboskî



Yaşar AKSU

Dema em bibêjin meha Kanûnê, wê çi were bîra we? Gelo tenê meheke ji 12 heyvên ji rêzê yên salê ango dawiya payîzê, destpêka zivistanê, ya na demên qetilkirinên ji kulîlkên Kurdistanê? Ger hûn ji malbatên Roboskî pirsiyar bikin wateya heyva Kanûnê, wê bibêjin tenê "mirin" e, wê bi hestên xwe yên brîndarbûyî bibêjin "mirineke sar e" û "ev çendî sale di qirikên me de dixetime û li ser singa me de dizetime". Lê belê ger hûn ji malbata 10 şervanên HPG ku 31'a Kanûna 2012'an de, di kemîneke xiniz û hovane de, bi çekên kîmyevî hatin qetilkirin pirsiyar bikin wê bersiveke çawa were dayîn gelo?

Di erdnigariya Kurdistanê de çawa ku dawiya sala 2011'an de dem bi êş û mirinê derbaz bibû, sala 2012'an de jî mixabin wisa hate jiyîn rojên dawiya salê. Hê birînê di dilê dayikên ji ber qetlîama Roboskî nekewiyayî, li Liceyê dîsa ji heman rengî ji destê dijmin qetlîameke din wekî Roboskî pêk hat. Dewleta Tirkî, 31'e Kanûna 2012'an de, li Licê bi 7 helîkopter û bi sedan leşkerên bi çekên kîmyevî ve, erîşî 10 gerîllayên têkoşer kir. Di vê erîşa xinizî de, Nûman Amed ê 23 salên xwe di tekoşîna azadiyê de derbaskiriye, Xebat ê 19 salan bi lingê xwe yê protez qet nerawestiyayî, Mashîro yê navê xwe ji lehengê nemir şoreşvanê Rojava hilgirtî, Demhat Baz ê ku ala ji destê rêhevalê xwe şehît Ferhat Kurtay wergirtî û tevlî 6 rêhevalên xwe şehît ketin.

Çîroka van 10 şehîdên li asîmanê Kurdistanê bûn stêrik çiqasî ji hev cûda û giranbiha bin jî, peyîtexta di dilê wan afiriyî de digihiştine hev, dibûne wekî hev. Dema Nûman Amed şehît ket, wê çaxê Fermandarê Eyaleta Amedê bû. 23 salan di refên gerilla de bi têkoşîna xwe ya bêhempa û bi rêberiya xwe ya bêheval bala serokatî kişandibû û bi gotina " Divê tu qet şehît nekevê! " şiyar kiribû.

***

Xebat di sala 1992'an de li Xakûrkê pê li mayîneke dike lingê wî jêdibe û heya sala 2012'an bi lingê protez têkoşîna xwe berdewam dike. Demhat Baz (Mesût Yildirim) gundiyê şehît Ferhat Kurtay e, giyanê nemir Kurtay hemêz dike û tevlî Hereketa Azadiyê dibe. Demhat Baz, her tim " Ez ji bo armanceke pîroz tevlî vê têkoşînê bûme" bi lêv dike. Ji ber vê yekê ji malbata xwe re her car dibêje wê şehadeta min ji we re bibe serfirazî. Hê 9 saliya xwe de di nav lêgerîna heqîqetê de bû piştî bibû şahidê zilma dewletê ya li ser malbat, bi taybetî jî li ser bavê xwe, bêtir jiyana tê de lêpirsin dikir.

Şehît Demhat Baz, li Gundê Xûrsê ya ku navçeya Mêrdînê Qoserê ve girêdayî Xwedê dide. Di nava malbateke 9 ferd û welatparêz de mezin dibe û ji ber vê yekê jî haydarê Partiya Karkerên Kurdistan e. Di sala 2003'yan de tevlî refên tekoşînê dibe. Di nav civakê de çawa be, li çiyê jî bi sekna xwe di nav rêhevalên xwe de pirr tê hezkirin. Rêberê xwe yê yekem her timî bavê xwe dibîne. Ji ber ku hê zarokatiya xwe de bibû şahidê têkoşîn û berxwedana bavê xwe yê li hemberî zilma serdestan. Pirr caran dît ku bavê wî ji bo aşitî, wekhevî û azadiyê çiqasî berdel dan. Hê di wan deman de biryara xwe dabû û xwe gihand warê hêviyên xwe.

**

Ji ber zilma dewletê, malbata Demhat Baz jî koçî Stenbolê dike wekî gelek malbatên li welêt. Xerîbî gelekî êş û zehmetiyan bi malbatê dide kişandin. Cara yekem li Stenbolê tevlî çalekiyan dijî dewleta dagirker dibe û li Bakirkoyê tê girtin. 9 mehan li Girtîgeha Bayrampaşa tê darazandin. Rojên di girtîgehê de xwe perwerde dike û hînî dîroka welat û welatiyên xwe dibe. Pirr pirsnîşan di serê wî de zîl didin. Êşkence û zordariyên li girtîgehê lê hatine kirin wî pirr bi hêrs dike, bandoreke mezin li ser çêdike. Piştî li girtîgehê derdikeve, ji ber pirsên di serê xwe û hêviyên xwe, teqez biryara xwe dide û berê xwe dide qadên azadiyê.



Meha Kanûne heyveke bêzagon e; xatirxwestina saleke dîrokî, silavdayina demeke nûh e. Kanûn, him meha mirinê ye him jî meha nemirinê ye, hem meha qedandinê hem jî ya vejînê ye. Ji bo malbata Nemir Demhat meha Kanûnê hem heyva qatlîamê ye hem jî meha şanaziyê ye.

***

Demhat ê ku caran digot; " Ger ez demekê bizewicim, ez hez dikim bibime zavayên Amediyan", li navçeya Amedê Licê ye şehît dibe. Şehadeta wî ya li Lîcê, dibe zavaniya wi ya Amedê. Belê şehadeta wî ya li Amedê dibe zavaniya wî ya Amediyan. Ji ber ku Nemir Demhat di nava malbat û derdoran xwe de pirr dihat hezkirin, piştî şehadeta wî civaka xwe pirr xemgîn dike.



Wekî ku kronolojiya her mehan ji bo gelê Kurdistanê bi xemgîniyê boyaxkiribe jî bêgûman bi navê lehengên nemir jî mohra xwe daniye. Her çiqasî heyva kanûnê bi jenosida Roboskî jandarî be, ji ber 10 gerillayên li Amedê şehît ketine jî wisa meheke derdmende. Heyva Kanûnê çawa ku di dilê gelê Kurd de ji ber sedema qetlîama Roboskî birîn vekiribe, di dilê malbata Demhat Baz de jî birîneke tu caran neyê kewandin vedaye. Malbata Nemir Demhat meha Kanûnê mîna mîratekê ji kurê xwe hemêz dikin her sal.

Meha Kanûne heyveke bêzagon e; xatirxwestina saleke dîrokî, silavdayina demeke nûh e. Kanûn, him meha mirinê ye him jî meha nemirinê ye, hem meha qedandinê hem jî ya vejînê ye. Ji bo malbata Nemir Demhat meha Kanûnê hem heyva qatlîamê ye hem jî meha şanaziyê ye. Beriya her tiştî ji bo Şehît Demhat Baz û rêhevalên wî yên nemir, meha Kanûnê, heyva şîrbirincê ye ku ewa jê pirr hez dikir, pirr dixwest ku demek werê, li welêt, li Kurdistanê, zarokên devliken û azad jê noş bibin, dilşêrîn bibin...

## Evîn û qêrîna Kurdan

# Dilo Mehmed Uzun

Cîhan ERDOGAN

Mehmet Uzun, di serê salên 70'an de dema M. Orucoglu, li Siwêregê (Siverek) têkoşîn dimeşand, tevlî tevgerê bû. Di sala êrîşa li Vartinîkê de, tevger windahiyên giran da. Wê salê, yek ji wan kesê ku hate girtin jî Mehmed Uzun bû. Gava qala salên xwe yên girtîgehê dikir, wiha digot: "Di qawîşê de qaçaxçiyekî kal hebû. Nivîseke kurdî li ser milê wî hebû, tirsa wî ew bû ku ewê ji ber vê nivîsê zilm û tadayê bibîne, lewma dixwest vê nivîsê ji ser milê xwe bibe. Min dît ku bi cilêtê çermê milê xwe kolaye û wê nivîsê jê biriye, milê wî di nava xwînê de mabû. Ev qaçaxçiyê ku ji bo nanê xwe bê tirs li çiya di nava mayinan de çûbû û hatibû, mixabin ji ber wê nivîsa kurdî ya li ser milê xwe ketibû nav tirseke mezin.

Di qawîşê de Mûsa Anter, di sohbetekî de bal kişand ser rewşa wî qaçaxçiyî û ji Mehmed Uzun re wiha got: "Tu halê me Kurdan dibînî? Kurdiya te baş e. Ji bo ku ev ziman bijî, bi kurdî binivîse."

Dibe ku çirûska wî agirê di dilê wî de Musa Anter pêxistibe… Ji ber vê yekê jî gava ku hat berdan, ket pêy şopa zimanê kurdî. Gava hat berdan guh da qêrîna kurdan û dest bi nivîsandina kurdî kir. Piştî zextên li ser wî û rojên dijwar ew jî neçar ma û ket nava karwanê penaberan. Swêd, weke ji gelek kesan re bû wargeh, bû wargeha wî jî. Civîn û sohbetên penaberan jî bûn sebep ku agirê hundirê wî gurtir bibe û wî xwe da nivîsandinê. Jiyana penaberiyê wisa kir ku, ji bilî nivîsandinê tu rêyeke din li pêşiya wî nema. Dema ku got "Ez ê romanek binivîsim" derûdorên wî pê dikeniyan, tinazên xwe pê dikirin, heta meriv dikare bêje ku hatibû tecrîtkirin.

Ew êdî ji Mehmed Uzun, derbasî Dilo Mehmed Uzun bû. Yanî dilê însan... Ji bo evîna însan karê xwe bi lêz kir. Mehmed Uzun ew rojên zexmet ku pê re rû bi rû mabû, bi van gotinan anîbû anîbû zimên: "Di mala xwe de, ji şevê heta sibê rûdiniştim, difikirîm û tenayî dibûm. Min darên ku berf girtibûn û spî bûbûn mîna bûkanî xemilandîne temaşe dikir û mijûl dibûm. Ji bo ku wateya peyvekî fêr bibim, bi seatan dixebitîm. Carna min telefonî dostên xwe yên li Diyarbekirê dikir û ji wan fêr dibûm."

Di pirtûka wî ya yekemîn a bi navê "Tu" (Sen) de kurdiya wî bi ser neket. Ewên ku wî tecrîd kiribûn û bi tenê hiştibûn, alîkarî nedidan û tinazên xwe pê dikirin. Her çend ew di nava zehmetiyan de bû jî, paş de gav nediavêt. Mirovek xwedî îradeyek xurt bû. Ji Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanê hêz û hest digirt û di wêjeya kurdî ya klasîk de pencereyek vekir. Karê wî zehmet bû. Mîna bi derziyê bîr bikole, ji bo zimanê ku weke ku axa miriyan avêtibûn ser, bi wêrekî xebat dikir. Û jixwe pêdivî bi helwesteke wisa hebû. Heta wê demê xebatek wisa çênebûbû, loma jî karê wî zehmet bû. Biserneketin, belkî jî wê vî merivê narîn û mezbût bixista înziwayê.

Dilo Mehmed Uzun, li ser mijara yên weke xwe ango yên binketî, tekçûyî, penaber dest bi nivîsandinê kir. Dem cuda bû, lê belê keder û hest wekî hev bû… Her peyv, her hevoka ku nivîsand wî pêş xist. Ji romana kurdî re pêşengî kir. Paşê wisa bû ku ewên ku di destpêkê de wî biçûk didîtin û tinazên xwe pê dikirin, jê re çepikan didan.

### Evîn, qêrîn, agir û surgûn

Yek ji Romana Mehmed Uzun a herî bi nav û deng, "Hawara Dîcle" ye. Di vê romana xwe hawara gelê jî tîne ziman.

Di "Hawara Dîcle" qêrîna Cizîra Botan vedibêje: Cizîra Botan di reveberiya Mir Bedîrxan de bûye warê vejîna kurdî. Li hemberî Birca Cizîrê, li cihê ku helbestvanê mezin Melayê Cizîrî perwerde bûbû, Feqiyê Teyranê ku weke dengbêjê gel tê naskirin jî perwerde bûbû. Tê gotin Ehmedê Xanê yê ku Destana Memê Alan û paşê jî bi navê Mem û Zîn berhemek mezin afirand jî li wir perwerde bûye. Li warê ronesansa Kurd di Medresa Sor de bi dehan xortên Kurd ji bo dîwan û edebiyata Kurd perwerde bûne û di wê medreseyê de jiyane. Li nêzîkî Medresa Sor, di Qesra Mîr Bedîrxan de, şevên mîhrîcanê bi awayekî şahî çêdibû. Dengbêjên ku dengê yekî ji yekî xweştir bi stran û kilaman reng didan mîhrîcanê. Bêrîvanên bi kirasên rengîn yên ku li pala çiyayên şîn bi dotina pez mijûl dibûn, zanaatkarên Ermen û gelê Asûrî û rengên cuda yên li deverê bi kelecaneke mezin li benda şevên dengbêjan bûn.

Yek ji wan hebû ku xizan û nenavdar bû, bi xwûşka xwe Gulîzar re di axurekî de dijîya, şivantî dikir. Ew kes Biroyê Êzîdî, an Biroyê Kor ango Biroyê Dirêj bû. Biroyê Kor, hevalê Migoyê Ermen ê ku bavê wî alim bû û şêwirmendê Mîr Bedîrxan bû. Xizan û dewlemend li Cizîrê bi hevre dijiyan. Biro bê Migo, Migo bê Biro nedibû. Cizîr û çiyayên Botan bi dengê dengbêj Biro dihejiya. Alim Mam Seyfo, dengê Dengbêj Biro guhdar dikir. Mam Seyfo, Dengbêj Biro girt û çû dîwana dengbêjan a li qesra Mîr Bedîrxan. Her car weke cejnekê, weke mihrîcanekê bû… Jin bi kirasên rengîn û kofiyên xemilandî, mêr jî bi şal û şapik hatibûn. Dengbêjan dor bi dor stranên xwe digotin, piştre jî bi çavnebarî li dengê Biroyê Kor guhdar dikirin. Mîr Bedîrxan jî li dengê Biroyê bi şewat guhdar kir û got, "Wî mirovê poz dirêj û kor bibin Medresa Sor". Ev gotin, deriyê jiyaneke nû ji Biro re vekir. Debara Biroyê Kor dê baş bûba. Lê belê Biro li dûv daxwazekî cuda bû. Ji niha û şûnde karibû bi rehetî biçûya mala Mam Seyfo, karibû xwarina xweş bixwara û bi rehetî karibû xwûşka Migo bidîta. Ne evîndarê wê bû lê bila jî, ji bo Biro ev guhertinek girîng bû.

Guhertina herî mezin jî dikarîbû êdî pirtûkxaneya Mam Seyfo ya navdar bidîta. Dîroka Kurd, dîroka Ermeniya û gelek tiştên veşartî fêr bûna. Mam Seyfo, her tim dixwend û bi Mîr Bedîrxan re guftugoyên kûr dikir. Biro ket nava pirtûkan. Tiştên herî bala wî dikişand; Kurdistana Başûr bû. Li kêleka Çemê Dîcle´yê, warê wan ê din, erdnîgariya perçekirî hemû. Evder tim di hişê wî de bû, lê belê ewê çawa biçûya wir? Piştî nîqaşên kûr û dirêj, dengbêj Biro û hevalê wî Migo, ji Mam Seyfo re qala ew warê ku bêrî dike kirin. Di dawiya vê reyê de mirin û winda kirin jî hebû. Dîsa jî tiştekî Mam Seyfo ji wan her du xortan re bigota tunebû. Lê belê destûr da û ji wan re got, "Biçin û bibînin". Migo, Biro û kûçikê xwe yê bi navê Garzan, bi kelekê ji Çemê Dîclê´yê ketin rê. Ev rê tev nepenî bû. Migo û Biro vir de û wê de di nava Çemê Dîcleyê a har de berba bûn û ji mirinê filitîn. Kurdên ku ber bi agir û rojê perzin dikirin, di bin zilm û êrîşa Kurdên misilman de bûn. Kurdên Êzîdî bi hesreta zimanê agir û rojê dişewitîn, ji hêla Kurdên misilman ve dihatin çewisandin û ji wan re digotin, "Ji mirinan mirinê biecibînin". Li rewşa Kurdên li Bakurê Kurdistanê jî ne cuda bû.

Dilo Mehmed Uzun; pencereya xiyanetê, belavbûnê û şikestinê vekir û xwest rê nîşanî Kurdan bide. Biro di gelek deran de deng veda, wekî Feqiyê Teyran xwe nişan da. Li her derê Botanê Kurd, rastî êrîşên Osmaniyan tên. Kurdên Êzîdî jî tên qirkirin. Biro li bilindahiya çiyayekî rastî Estera Êzîdî



www.arsivakurd.org

**Dilo Mehmed Uzun, dîroka bêbextiyê û Kurdên ji pişt ve xencer xwarine, rastî xiyanetê hatine bi xwendevanan dide nasîn. Her romanek, her çîrokek, her serpehatiyeke ku qala wî dike dîroka îro jî ronî dike û ji nifşên nû re dibe dersek.**

**Dilo Mehmed Uzun bêbextî û jana ku gelê Kurd kişandiye, di salên sirgûnê de li Swêdê nivîsand. Weke ku bi derziyê bîrê bikole, wêjeyeke Kurdiya modern derxist holê. Ji bo zimanê Kurdî ked da û bi hezaran xwendevanên wî bersîva vê keda wî dan.**



www.arsivakurd.org

ango rastî Stêrka birîndar dibe. Tîne mala xwe û vedişêre, birîna wê derman dike û dibe evîndarê wê. Lê belê begên Kurdan di mala Biro de Esterê dibînin. Ev jina birîndar digrin didin tacirên xulaman. Dengbêjê ku nav û dengê wî li Kurdistanê belav bûyî; Dengbêj Biro jî davêjin zîndana Cizîrê ya navdar. Ji zîndankirina Biro ne Mîr Bedîrxan, ne xanima wî Rûşen Xanim û ne jî Êzdînşêr razî ye. Lê belê toreya Kurdan wisa emir dida. Ji hêlekê dengê Kurdan ji zindanê bilind dibe, lê belê evîna wî jî di destê tacirê xulaman da, di rêyên koçberiyê de ye.

### Lêgerîna êvînê

Osmanî û Îraniyan li hev kirin û plana qirkirina tevgera Kurdan xistin dewre. Mîr Bedîrxan kete ferqa vê. Xelkê Baban, Soran, Behdînan, Colemêrg, Mîks, Bedlîs, Siwêreg, Mirê Şikakê û Mêrdîn, Nisêbîn, Serêkaniyê, Riha, Hatay, Çiyayê Kurda, Heleb, Amed, Dîlok, Meletî, Xarpût, Dêrsim û Wanê, begên Serhedê, seyît, şêx, axa û pêşiyên wan li qesra xwe kom kir û li ser rewşê civîn lidar xist. Lê belê agahiyek hat û gotin Osmaniyan û Êzdînşêr li Musilê bi awayekî dizî peyman mor kirine. Li gorî peymanê, Êzdînşêr wê bibe hikumdarê Cizira Botan.

Êzdînşerê dirêj, bedew, xwediyê soza xwe û xwarziyê Mîr Bedirxan ê heq, bi arteşa Osmaniyan re peyman danîbû û apê xwe firotibû. Dengbêj Biro ji zindanê azad bû û digot "hawar lo hawar" û sewta wî bilind dibû. Ewrên reş bû qedera Kurdan, girt ser ava Dîcle û tarî kir.

Mam Seyfo got, "Kurmê darê ne ji darê be, zewala darê nabe", lê belê tişteki karîbûya bikira nemabû. Bi lihevkirina Îranî û Osmaniyan, ew herdû dewlet bi xiyaneta xwarziyê Cizîra Botan, Kurd xistibûn bindest. Dor li birca Cizîrê girtin. Dengê Asûrî, Ermenî û gelê din nedihat û di nava wahşetê de winda dibû. Êdî Cizîra Botan di nava xiyanetê û dewşirmê de bû. Li ser Birca Cizîrê mij bilind dibû û li hemberî topa têkoşêr westiya. Piştî şerê dijwar Mîr Bedîrxan bin ket û teslîm bû. Medresa Sor û Qesra Mîr Bedîrxan, Birca Belek jî reş dibû. Kaniya Sipî ku cihê keçên bûkanî bû, êdî bû cihê êsîran. Ew sal ji bo Kurdan salên reş bûn, ji bo Kurdan dema mirin û mayînê bû. Di wê demê de sewtek zelal û bişewat bû mevanê stranên Kurdan. Êzdînşêr bû mîr, Mîr Bedirxan jî bi bêbextî, bi binketî û xencerkirî, di bin esareta xwarziyê bêbext û Osmaniyan de, bi rûmeta şikestî birin surgûnê.

Destpêka rê, êş û qêrîn wekî mişextên cemidî...

Bi carekê kulîlk ji axa xwe qetiyabû û ewê edî li tu derê nebûya azad. Mîr Bedîrxan, Mam Seyfo û kesên bi wî re li keştiyê siwar kirin û şandin Girîtê. Gava keştî nezîkî Girîtê bû, Mam Seyfo û çar kesên bi wî re avêtin Derya Sipî û fetisandin.

Ku binketin carek dest pê bike, mina kêlên dûrîne li dû hevdû tê.

Mîr Bedîrxan û xanima xwe Rûşen Xanim li xaniyekî, Migo û Dengbêj Biro jî di xaniyekî biçûk de bi cîh kirin. Migo û Biro, di kirin û avakirinê de bihevre kar dikirin, lê belê dîsa jî dilê wan her tim bi hawara Dîcleyê re bû. Şûna axaftinê û şahiyê, bêdengî, xemgînî û xerîbî girtibû. Li ser xizaniyê surgûnî hatibû ser Migo. Bi guhdarîkirina sewta Biro, Migo bi rondikên çavên xwe qise dikir. Gava roj mîna topên agir çiyayên Girîtê germ dikir, Migo di nava cihê xwe de bûbû weke kevir.

Mam Seyfo û kurê wî Migo, di nava Derya Sipî de xeniqîn. Mîr Bedîrxan, dengbêj Biro û kesên li dora xwe li pey xwe hişt û li gorî qanûna nû a surgunê berê xwe dan Sûriyê û ketin rê. Êzîdî, Asûrî û Kurdên mişextî, niha li welatê xwe li perçê dinê Kurdistanê bûn.

### Dilo Mehmed Uzun hestên gelê xwe anî ziman

Dilo Mehmed Uzun, hestên gelê xwe û yê xwe kir yek û ev bi awayekî dokumanterî anî ziman. Êş û qêrîna evînê kir mîna qêrîna azadiyê. Dîroka Kurdan ya wan salan bi êş bû, dijwar bû. Rastî qirkirin û surgûnê hatibûn. Welatê wan dagir kiribûn û di bin zilma dagirkeran de mabûn. Ev bûbû sedema hemû êş û jana wan û wekî marazê dev ji wan bernedida.

Ji Cizîra Botan, li dû hev nûçeyên xerab dihat. Osmaniyan bi lîstikek nû Êzdînşer bin xist û di ser riya Suriyê de berê wî dan aliyê dinê yê Dîcleyê surgûniyê. Ew ê ku ji bo desthilatî û hêrsên xwe apê xwe ji paş ve xencer kirîbû, jî rastî heman aqûbetê hat û ew jî ji derbe xwar. Bêbextî li ser bebextiyê dît û dû re çû cem apê xwe Mîr Bedîrxan. Lê belê ne Mîr Bedîrxan, ne Rûşen Xanim ne jî Biro neçûn serdana wî. Ew bi tenê ma.

Dilê Mîr Bedîrxan êdî ewqas bêbextiyê ranedikir rojekê dilê wî sekinî. Mîr Bedîrxan çû ser dilovaniya xwe. Dengê Kor Biro ango Dirêj Biro, li aliyê Çemê Dîclêyê yên din deng veda. Dixwest hawara xwe bigihîne her kesî. Hawara Biro gihaşt hemû Kurdên li erdnîgara perçekirî. Êzdînşêr ê ku apê xwe ji pişt ve xencerkirîbû, di rêwîtiya dawî de jî xêr nekir.

Dilo Mehmed Uzun, dîroka bêbextiyê û Kurdên ji pişt ve xencer xwarine, rastî xiyanetê hatine bi xwendevanan dide nasîn. Her romanek, her çîrokek, her serpehatiyeke ku qala wî dike dîroka îro jî ronî dike û ji nifşên nû re dibe dersek.

### Serhildana Çiyayê Agirî

Piştî her roman û çîroka ku tê xwendin, Dilo Mehmed Uzun, wê dawetî romanên dinê dike. Vê carê qala serhildana Çiyayê Agirî dike: Birêz Memduh Selîmê ku li derveyî welat perwerde bûye, zirav, narîn, entelektuel e. Wî û xanima wî Ferîha Xanim surgûnê Hatayê kirin. Memduh Selîm hesreta welatê wî Kurdistanê û êvîna wî roj bi mezin dibû, êdî jan dida. Bûbû mîna topeke agir. Kurdistan êdî gazî wî dikir.

Araratê destana xwe dinivîsand. Çiyayê Agirî ji aliyê hemû gelan ve tê nasîn; ku bi farisî dibêjin çiyayê Nuh, bi ermenkî dibêjin Masis, bi erebî Cebel el Hari û di dîroka mirovatiyê de cîh daye keştiya nebî Nuh, carê deriyê ji Mumduh Selîm beg re vekir û kir mêvanê xwe. Di nava coşa serhildanê de Memduh Selîm Beg pêşwazî kir. Memduh Selîm Beg pêşengiya serhildanê dikir; ew çend serhildan, ew çend qêrîn bû… Piştî demekê bi sedhezaran yekîneyên artêşê dest bi şewata Araratê kirin. Hawara Araratê, qêrîna jin û zarokan digiha ezmanan… Erd dinaliya, çiya dikir hawar. Kêzik ji helîna xwe baz didan.

Dîsa jî artêşa dewletê ji xwîna Kurdan têr nedibû. Agir berdan zêdeyî sê sed gundan. Zêdeyî dehhezar Kurdên mazlûm hatin qetilkirin. Bi hezaran Kurdan malên xwe, warên xwe li pey xwe hiştin û koçber bûn. Dinyayê li tevkujiyê temaşe dikir, lê belê dengê xwe nedikir.

Agahiya qirkirinê gihişt Hatayê. Agir ket dilê Feriha Xanim. Qetilkirina Memduh Selîm Beg jî bîhîst. Bi salan şîn girêda û jana wê qet bi dawî nebû. Malbatê xwe wê bi yekî din re zewicand û Feriha Xanim xistin riya Sûriyê. Piştî çend mehan şûn de Memduh Selîm Beg xwe gîhand Hatayê, lê belê felaket li bendê bû. Tevî êşa Agirî, êşa evînê jî kişand. Piştî ku Hatay ket nav sînorê dewleta Tirk, berî wî dan surgunê û li Suriyê bi cîh bû.

Dilo Mehmed Uzun di pirtûka xwe ya bi navê "Li Bin Siya Evînekê Winda" de êşa Mîr Bedirxan û Memduh Selîm Beg bi zimanê xwe yê zelal û bi hostayî gihandiye hev.

Dilo Mehmed Uzun bêbextî û jana ku gelê Kurd kişandiye, di salên surgûnê de li Swêdê nivîsand. Weke ku bi derziyê bîrê bikole, wêjeyeke kurdiya modern derxist holê. Wer bû ku ew ziman deriyê dimenên gerdûnî li dinyayê vekir. Ji bo zimanê Kurdî ked da û bi hezaran xwendevanên wî bersîva vê keda wî dan. Lê di bihara jiyana xwe de, di demeke ku herkes li benda pirtûkên wî yê nû bû ew jî rastî bebextiya nexweşiyê hat. Piştî ku nexweşiya benceşerê lê peyda bû, xwest biçe welatê xwe Kurdistanê. Rojên xwe yên dawî bi gelên xwe, hezkiriyên xwe û xwendevanên xwe re derbas kir. Li bajarê ku herî zêde jê hez dike de, li Amedê çû ser dilovaniya xwe. Kurd îro jî rastî zilmê tên, lê li hemberî vê zilmê berxwedana Kurdan jî heye. Hawara Dîcleyê nesekîniye, lê li cem vê hawarê tilîliyên dayîk û jinan yên serhildanê jî bilind dibin. Li her aliyên Kurdistanê serhilndan e. Ji bo qedera Kurdan nebe weke Mîr Bedirxan, Mam Seyfo, Dengbêj Biro û Memdug Selîm Beg, nifşên nû li ber xwe didin.

Dengê evîn û qêrîna Kurdan Dilo Mehmed Uzun bila dilê te rexet be, ciwanên Kurd wê xeyalên te pêk bînin...

**Wergera Kurdî: Diyar Dêrikî**

# Kevok ...



> Êşek li ser rûye wî da. Mîna ku bikeve bîrekî bêbînî, aqil ji serî çû. Hîn awirên wî li ser bask û periyên hevala wî bûn. Bi heft dilan êşiya. Mîna ku guleyek li kezeba wî ketibe, jana wî di bibîkên wî de derbûn. Qîrînek bêdeng ji kurajiya dilê wî fûriya û di dîwarên qorîdorên hepsê de berz bû…

A.Selam BARAN*

Bi cop û kalasan ve ketin hundirê qawîşê û bi xirecir û barebar qîr didan:

- Pêgerîn heye, bila her kes derkeve hewşê. Zû bikin, lêz bikin!..

Girtiyan xwe berdan hewşa qawîşê.

Leşker û gardiyanan demeke dirêj lêgerîna qawîşê berdewam kirin. Wekî her car vê carê jî kinc û firaqên wan tevî hev dikirin. Her tişt diavêtin quncikekê û li erdê pêpes dikirin.

Gardiyanekî serê xwe ji deriyê hewşê dirêj kir û girtiyan li ber dîwêr weke tizbiyê rêz kir, kenek şeytanî li ser lêvên wî rûnişt. Bi çavên xwe yên hûrik û kesperî, mîna çavên pisikên kolana li girtiyan nihêrî. Gardiyan Celo, mîna zebaniyan, reş û kîndar bû. Her ku tiştek biqewimiya beriya her gardiyanî wî êrîşî dibir ser girtiyan û ew diavêtin feleqeyê, îşkence bi wan dikir.

Celo û du gardiyanên ku di destê wan de pêşgirek bi rengê kesk û sor hebû, hatin hewşê. Li girtiyan mêzêkirin û yek car qîr dan:

- Ev pêşgir ya kê ye?

> Rojekê refek kevok hatibûn û li ber pacê venîştîbûn. Gozela keskeşîn çû cem wan. Dema refê kevokan çûbûn, ew jî bi wan re firiyabû û çûbû. Wekî ku dibêjin, her teyr bi refên xwe re difire. Gozelê jî bê ku ji hevalên xwe xatirê xwe bixwaze çawa hatibû, wisa jî çûbû. Dildar bi çûna Gozelê xemgîn bû. Wê şevê mîna ku tiştek jê kêm bibe, dilê wî pê ve ma.

Dildar pêşgira xwe nas kir û got: "Ya min e." Di vê gavê de çend leşker aliyê din ve dipirsîn, "Te ew pêşgir ji kû aniye, çima bi wan rengan e? Ev rengên rêxistinê ne." Dildar got:" We bi destê xwe daye min." Lê kesî wî guhdar nedikir. Mîna gayê ku çav bi paçê sor bikeve, êrîş birin ser. Ew dabûn nav xwe û bi daran lêdidan. Dildar dest bi dirûşman kiribû. Dema hevalên wî dengê Dildar bihîstibûn, wan jî mîna xelekên zincîrê mil bi mil bûn û dirûşmên dijî îşkence berz dikirin. Leşker û gardiyan weke gurên ku devê wan bi xwînê ketibe, hîn bêhtir êrîşkar û har dibûn.

Di wan rojên qiyametê de di hepsa Erziromê de, wê salê zivistanek dijwar qewimî bû. Bi rojan berf dibariya. Berf hewş girtibû. Hingî sar bû, camên paceyên biçûk du sê tiliyan qeşa girtibû. Hingî her der berf bû, tenê perwazên paceyan bê berf mabû. Loma Kevok û qijikên derdora hepsê dihatin xwe li perwazên bê berf digirtin. Zivistan, li ser betona herikî bû. Çavên girtiyên dil azad li ser wan bû. Kevok di cemeda zemheriyê de dicirifîn. Bê westan û rawestan lingên xwe li pey hev diguherandin û dixistin nav periyên xwe yên belbûyî. Dilê girtiyan bi van kevokan dişewitî. Nan û savara ku ji ber wan dima, bi wan re parve dikirin.

Serê sibehê dema deriyê hewşê vebû, Dildar derket derve. Bi derketina hewşê re di nav berfê de kevokeke kovî dît. Di bin kuliyên berfê de xwe guvaştibû ser hev û di quncika dîwêr de melisîbû. Hingî qerimîbû ji cihê xwe nikarîbû xwe tev bida. Dildar her ku bi nermahiya berfê nêzî wê bû xwe civand ser hev. Her ku xwe melisand biçûktir bû. Dildar niha li cem ê bû. Bi germahiya xwe destê xwe dirêjî wê kir. Kevok hewl da ku baskên xwe veke, berf pekiya. Hêdîka ew ji nav berfê derxist, lê nihêrî, li ser per û baskên wê xwînek reş û qirêj hişk bûbû. Rabû bir hundir. Li paçekî pêça û danî ber kaloriferê. Gava ku piçek xwîna wê germ bû û bi ser hemdê xwe ve hat, hinekî lebitî.

Hin hevalên Dildar jî hatin ser serê kevokê. Lê nihêrîn. Kevok ji baskê xwe birîndar bû. Xwîna wê li ser baskên wê hişk û zûha bibû. Çend balmeyên tivingê di nav goştê wê de dixwiyan. Kevokek keske şîn û birqok bû. Di bin ronahiyê de stûyê wê yê kesk û ziravok weke stêrkê şewq dida. Lê nihêrîn, heke birîna wê derman nekirina, dê kevok di destê wan de bimira. Dildar çû ciletek nû û ta û derzî anî. Hevalekî wî jî ava germ... Jixwe wekî din tu derfet û dermanên wan tunebûn.

Bi ava germ baskên wê şûştin, xwîna hişk û zuha jê birîn. Balmayên di goştê wê de bi mûçingê derxistin. Birîna wê pak û paqij kirin. Dû re jî bi ta û derziyê, bi kêlên hûrik çermê wê dirûtin. Her ku kêlek diavêtin birînê, kevokê di nav destên wan de diperpitî. Lê ji bo ku baş zeftkiribûn nedihiştin ku xwe zêde bilebitîne. Bi hemû milan ve hewl didan ku wê pak bikin. Di dawiyê de hinek merhem li ser birîna wî kirin û bi paçekî pêçandin. Dildar, bi vî halî baş lê dimêzand. Cihê wê li ber kaloriferê çêkiribû û qut û ava wê jê kêm nedikir.

Tenê derdê wî ew bû ku gardiyan nebînin. Loma heta jê dihat vedişart.

Gelek dem derbas nebûbû, kevokê hema hema mirinê ji ser xwe avêtibû. Ji nû ve rih pê de hatibû. Birîna wê pak bibû û ji nû ve per û bask pê ve hatibûn. Êdî ew jî bibû yeke ji wan. Girtî tev dihatin pê şa dibûn û henek pê dikirin û sebra xwe pê dianîn. Rojên xwe yên di bin lêdan û îşkenceyê de bi wê re dibûhirandin. Wan jî kevok yekê jixwe dihesibandin. Navek jî lê kiribûn: Gozelê! Gozelê jî ji halê xwe kêfxweş bû. Ew jî hinî wan bûbû û bi wan re digeriya, diçû û dihat. Li ser ranzê wan vedinîşt û bi serbestî ji serê qawîşê diçû serê din. Rojên xwe bi vî rengî dibihûrandin.

Rojekê refek kevok hatibûn û li ber pacê venîştîbûn. Gozela keskeşîn çû cem wan. Dema refê kevokan çûbûn, ew jî bi wan re firiyabû û çûbû. Wekî ku dibêjin, her teyr bi refên xwe re difire. Gozelê jî bê ku ji hevalên xwe xatirê xwe bixwaze çawa hatibû, wisa jî çûbû. Dildar bi çûna Gozelê xemgîn bû. Wê şevê mîna ku tiştek jê kêm bibe, dilê wî pê ve ma.

Dengê lihevdana baskekî li ber guhê wî ket. Guhê xwe da dengê ku bi qasî ramûsenakê sivik bû. Berf dibariya taritiya şevê. Dengê baskê ku diteyisî, bi şikestî û qut qutî dibihist. Dîtina ku dît, kevokek bi lezker bi wî dihat. Kevok rasterast bi lezgînî nêzî çavên wî dibû. Çavên wî kurkusin. Dildar şiyar bû! Dengê di xewna wî de di guhên wî de bû. Dem çavên xwe vekir, Gozelê li pişt camê lê mêze dikir û nikilên xwe yî sorik li camê dida. Bi lez betanî ji ser xwe avêt û bê ku şimika xwe pê bike, beziya. Hilkişiya ser kursiyê, camê vekir û Gozelê bera hundir da. Bi hatina Gozelê, Dildar û hemû qawîş dilşad bûbû.

Di wan rojan de dema gardiyan êvarî hatin girtiyan bihejmêrin, çavên Celoyê gardiyan bi kartona Gozelê ketibû. Dema ku li qertonê nihêrîbû, Gozelê tê de dîtîbû. Bi xişim destê xwe dirêjî Gozelê kir ku wê bibe. Dildar ew dît, xwe avêt ku Gozelê ji nav lepên wî derxe, lê komek gardiyanên ceberût bi milên wî girtin û nehiştin. Di nav wê xirecirê de gotin:" Kevok qedexe ye. em ê wê berdin bila bifire here." Destê Dildar jê qut nedibû. Lê çi heyf bû ku tu tişt ji destê wî nedihat.

Gava serê sibehê gardiyan ji bo taştê gazî qawîşê kir, Dildar û hevalekî xwe berê xwe dabûn mutbeqê. Dema di qorîdora hebsê de diçûn, çavên Dildar bi teneka çopê ket. Bala xwe tev da ser wir. Lê mêzekir ku çend perî û baskên keskeşîn li qeraxa tenekê belawela ne. Tirsekê xwe berda ser dilê wî û nefesa wî çikiya. Xwe baş nêzî teneka çopê kir û li hundirê wê nihêrî; nihêrî û dît ku teneke bi per û baskên keskeşîn tije ye.

Yekcar ber çavên wî tarî bû. Êşek li ser rûye wî da. Mîna ku bikeve bîrekî bêbînî, aqil ji serî çû. Hîn awirên wî li ser bask û periyên hevala wî bûn. Bi heft dilan êşiya. Mîna ku guleyek li kezeba wî ketibe, jana wî di bibîkên wî de derbûn. Qîrînek bêdeng ji kurajiya dilê wî fûriya û di dîwarên qorîdorên hepsê de berz bû…

*Girtîgeha Aliaga/İzmir

www.arsivakurd.org

# Jinên leheng ên bê tirs

Pelşîn TOLHILDAN

Li ser şehadeta wan 3 sal derbas bû. Lê hîn jî dema em dixwazin qala wan bikin, peyv sîtûxwar in. Sakîne Cansiz, mamosteya têkoşînê ya me hemûyan bû, qehremana me, leheng û îdola me bû. Ew lehenga ku bi cesaret û bêtirs bi ser zaliman de diçû û tif dikir rûyê wan… Di meha Çilê ya 2012'an de di nameya ku ji min re nivîsandibû de gotibû, "Ez dixwazim mirina min jî di tama şer û têkoşînê de be.." Lê dijminên Kurdan, dijminê ku li dijî azadî û aştiyê ne wê bi xaîntî û bebextiyeke mezin kuştin. Yên wê û du hevalên wê kuştin ê ku celadê Esat Oktay jî afirandibûn. Tetikkêş ew e ku dojeha zindana Amedê ya mirovahî û rûmetê xistiye bin piyê xwe înşa kirine. Ew jina qehreman ku li dijî dojeh û celadê wan serî netewandibû bi bêbextî û namerdî kuştin. Ji ber ku wê bi serbilindî û bê tirs li rûye celadê xwe nêrîba, ji paş ve kuştin. Ji ber ku weke ku Sakîne Cansiz gotibû; wê bi şer û têkoşînê şehîd ketiba. Wê bi wî rihê şer û têkoşînê li rûyê reş yê mirinê nêrîba, bi mirinê re şer kiriba. Yên ku wê kuştin, 40 sal bû ku Sakîne nas dikirin. Ew dizanîbûn ku Sakîne, rêbera jinên pêşeng ya gelê ku li dijî wan şer dike ye. Bi berxwedana xwe ji destê mirinê rizgar bûbû. Wê nas dikirin…

Sakîne Cansiz, di dewsa çek de, bi dengê xwe daketibû meydanê û di berxwedana zindana Amedê de weha gotibû: "Barîkat, berxwedana di dema Komuna Parîsê de û şerê barîkatan a me di pirtûkan de xwendibû dianî bîra me. Gel, li kolanan yekîneyên berxwedanê saz kiribû û şer kiribû. Yên di romanan, di fîlman de dihate gotin dihat pêşiya çavê min. Lê me di şert û mercên bê hempa de barîkat danîbû. Çekê me bawerî û vîna me, bedena me ya tazî bû. Niha tenê zimanê me diaxivî an jî şer dikir. Me di dewsa gule de dengê xwe diavete wan…" "Sakîne Cansiz - Her Şer Bû Jiyana Min-2)

Sakîne, çîroka dîroka jina azad a 40 salan e. Bayê jineke qedîm ku rihê xwe yê berxwedanê daye yên ku di van 40 salan de hatine nivîsîn û piştî vê bên nivîsandin e. Zanistek bû û enerjiya rihê jina ku berî dîrokê û di dîrokê de jiyaye fêmkiribû, bilêvkiribû û jiyiyabû. Tevî Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez ku bi wan re hatibû qetilkirin, tov û soza serketinê di rih û têkoşîna jina Kurd de çandin.

Pêşengên wî gelê ku li hemberî zilmê jiyan û mirinê di tama şer û têkoşînê de jiya ne. Ew, kelheya rûhî a herî qewîm yê şervanên rêveberiya xweser ku îro li hemberî zaliman mewzî girtine. Ji ber vê yekê Endama Meclîsa DBP Sêvê Demîr, Hevseroka Meclîsa Gel a Silopiya Pakîze Nayir û aktîvîsta KJA'yê Fatma Uyar ku li Silopiya ji aliyê hêzên dewletê ve hatine qetilkirin, di hiş û mêjiyê me de bi van sê milîtanên leheng re bûn yek. Yên wan qetil kirin bi heman zîhniyeta kuştinê re ketin dewre. Kuştina wan, li hemberî siyaseta legal a Kurdistanê îlana şerê faşîzmê ye. Li hemberî gelê ku bi daxwaza siyaseta demokratîk û aştiya bi rûmet a gelan ketibûn hilbijartinên 7´ê Hezîranê û bi ser ketibûn, ev peyam dabûn: "Ferqa xwe ji PKK nîşan bide, li parlamenê siyaseteke bi "aqil" bimeşîne. Ji çiyê û gerîlayan dûr bisekine ku tu di navberê de neçe. Di nav sînorê "rewa" a parlamenê de lîstoka demokrasiyê bilîze!"



Wateya vê mesajê di dîroka gelên têkoşer de eşkere ye. Lê belê bersiva kesên ku bi nirxên Têkoşîna Azadiya Kurdistanê mezinbûne jî eşkere ye. Sêvê, Pakîze ve Fatma ji ve ber ev bersiva xwe tevî gel li çeperên herî pêş yên berxwedanê dan hatin qetilkirin. Wan nîşan da li hemberî wê dewleta ku siyaseta legal, rêxistinbûna demokratîk, zimanê dayîkê, çanda netewî û çalakî qedexe kiriye, şerkirin parastina rewa ye û ji ber vê yekê di temenê ciwan de derheqê wan de fermana kuştinê dan. Têgihiştina ku li navenda Parîsê Sakîne Cansiz, Fidan Dogan û Leyla Şaylemez da kuştin ya ku berwedana parastina cewherî kir hedef û Sêvê, Pakîze û Fatma da kuştin ev e û yek e. Ji vê ti şik û gumanê gelê Kurd, jin û ciwanan nîne. Ew vê rastiyê baş dizanin.

Ji ber vê yekê ev jin evîndarê aşitî, demokrasî û azadiyê ne; xeta berxwedanê ya DBP, tevahiya meclîsên gel û KJA'yê ne. Sêvê, Pakize, Fatma bûn şervanê heqîqata gelê Kurd ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi van gotinan tîne ziman: "Parastina rewa mafekî bingehîn a hiqûqê ye… Gel, li hemberî neheqiyên ku li dijî ziman, çanda wî tê kirin, eger rêyên siyasî û hiqûqî xetimîbin, pêwîst bike dikare bi awayekî demkin an demdirêj dest bi berxwedanê bike. Ev ne îsyan, mafekî rewa û hiqûqî ye. Nebikaranîna vî mafî, binpêkirina hiqûqê ye…"

Rewşa ku îro gelê Kurd pê re rû bi rû ye, ev bixwe ye. Li Tirkiye di rewşa niha de rêyên hiqûqî û siyasî xetîmîne an nexetimî ne? Komediya AKP a ku dibêje "Eger samîmiyet hebe em ê di destûra bingehîn a nû de li hev bikin" li dijî rûmet û azadiya gelên Tirkiyeyê heqaret e, an na? Li Tirkiye îro faşîzm qasî ku îtîraf bike ku ji xwe re Hîtler mînak digire pêş ketiye, an na? Erdogan ê dîktator artêşa taybet û bi pere ku ji wan re mamosteyê dike, weke çeteyên DAIŞ'ê dibe ser gelê Kurd û gelê Kurd bi destê wan dide qirkirin an na?

Wê demê helwesta gelê Kurd a serekê divê nûjenkirina dîroka civakî be. Ango li dijî zilmê bi mîrasê berxwedana Mazlûman parastina jiyanê! Hêza jinên Kurd ku di qada civakî û çiyê de li hemberî êrîşên faşîzan pêşengî kir, israra wê ya dixwaze bibe mîsogeriya aştiyeke bi rûmet a gelan; 9´ê Çilê li Parîsê, 5´ê Çilê li Silopî kirin hedef. Jinên pêşeng bi zanebûn û bi plan, ji bo darbe li rihê berxwedanê bidin hatin qetilkirin. Her aliyên Kurdistanê ji bo hesabê van komkujiyan bipirsê wê li ber xwe bide. Jin û ciwanên Kurd wê bi mezinkirin û dewlemendkirina ziman, rêbaz, dem, mekan, têsîr û encamê parastina xweser bersîvê bidin van komkujiyan. Ti carî wê paş ve gav neavêjin! Ew cesaret, vîn û baweriya Sara ku di dojeha zindana Amedê de tif kiribû rûyê celad Esat Oktay, wê bi biryar û îrade her tim bibe rihê têkoşîna rêveberiyên xweser…



www.arsivakurd.org

# Dizanim

Dizanim, tu evîndara êgir î
Pêt bi pêt hez dikî
Dizanim,
Tu evîndara Mazlum î
Bi çeman, bi biharan evîndarî

Mizgîn RONAK




www.arsivakurd.org